

PÊNÛSA



NÛ

Hevbenda Nivîskar û Rojnamevanên Kurd li Sûriyê

rojnameyeke çandî ye , ji we anên Hevbenda Nivîskar û Rojnamevanên Kurd li Sûriyê - hejimar ' 2 ' Tîrmeh 2012

Pênûsa duyemîn



YEKÎTIYA ME HEBÛNA MEYE



Hu yarê Emerê Lalê

“Pênûsa Nû” rojname ye, ne kovar e. Rojname dikarin hemû celeb û êweyên nivîs û berhemên hembeş bikin, ta bi reklam û wêneyên taybet.

Nav “Pênûsa Nû” ye, nayê wê wateyê ku tenê nivîs û berhemên nû û nûjen diwe îne û deryê we andinê di rûyê nivîsên din de digre. Jixwe nema bi pênûsan tê nivîsandin, dem dema laptop, Iphone û Ipadan e. Nav astengî û pirsgirêkan li pê yî nivîsên ne nû ne jî kilasîk dernaxîne.

Pi tî derketina jimara yekemîn, gelek dost û zikê ên çand û wêjeya kurdî name andin, bîr û boçûnên xwe, rexne û dîtînen xwe gihandin me. Di wexta ku em gelek gelek spasiya wan dikin, em dibêjin: eger ne ji mirovên mîna we ba, ew ê ji zû ve ziman, çand û wêjeya me kurdan seqet û bawî bibûya. Me hin têtîbî û rexneyên wan bi cih anîn, wek ji hev cudakirina her du zimanan, kurdî û erebî. Emê ji ana û bi ûn ve bi her du zimanan du rojnaman derxînin. Her wisa emê hemû karînen xwe bi cih bînin daku zimanê kurdî bilintir bikin. Li vir bang li zikê ên zimanê kurdî dikin ku ji me bêtir xwedî li rojnameyê derkevin, em karekî teknîkî û rêxistinî dikin, belê ew bi nivîs û berhemên xwe dikarin xwedî li ziman û pê ketina rojnamê derkevin.

Jimara yekemîn tecrube û gava yekemîn bû, bê guman hin a î û çewtî derketin, em soz didin ku emê jimar bi jimar rojnamê ber bi aso û astek bilind ve bajon, her wisa emê hemû bi hevûdu re wan a î û çewtiyan nehêlin û rojnamê gav bi gav bi pê ve bibin.

Li welêt “Pênûsa Nû” çap bû, lê jimarek hindik. Hêviya me û we ew e ku pi tî rûxandina rêjîma diktator bi jimar in mezin çap bibe û bighê hemû destên zelal û xwe ik.

Emê hewl bidin jimar bi jimar guhertinên ba û pîroz bixin rojnamê, wek, emê dest bi hevpeyvînan bikin, emê bi navê rojnamê hin pirsan ji nivîskaran re bi înin û li gel bersivên wan biwe înin. Her wisa emê di her jimarê de çîrok û serpehatiyên folklorî yên curbecur biwe înin.

Mixabin nivîskarên kurdî-nivîs kêr in, yên hebûn jî hema hema çûn û ketin dawa erebî, ji ber wê emê bi pîlan derfetê bidin nivîs û berhemên kurdî, navên nû û kevn, daku em nivîsandina bi kurdî ge bikin, daku kurd bi kurdî binivîsin, ji ber wê rojname ne berpirsyar e di ber êwe û naveroka nivîs û berhemên de.

Rojnama Pênûsa Nû rew enbîrî, wêjeyî û hunerî ye, rojnama we ye, xwedî lê derkevin, bixwînin û bidin xwendin.

Mercên we anê

-Rojnama Pênûsa Nû gotar û helwestên siyasî, daxwiyaniyên partî û rêxistinên nawa îne, di heman demê de lêkolîn û gotarên rexneyî ji bo sûdwergerî diwe îne.

-Gotar an berhema bê wêne, navnenas û bi naveroka ne di ast û ramana rojnameyê de be nayê we andin.

-Em nivîs û berhemên bê naverok, her wisa wan nivîsên ku dê kesekî birîn, tawanbar û her weha kesayetiya hin mirovan birîn bikin, nawa înin.

- Berhemên werin we andin bi taybetî yên rojnameyê ne, bi hêviya li cihêkî din nehatibin we andin.

- Birêvebiriya rojnameyê di balavkirin û nebelavkirina nivîsan de azad e, her wisa rojname ne tim mecbûr e sedemên nebelavkirinê diyar bike.

- Em wek desteya rojnameyê ji mafê xwe dibînin ku zimanê nivîsan serrast bikin, lê divê ku naveroka nivîsê neyê guhertin, mebesta me ew e ku zimanekî petî ji rojnameyê re hebe, ji ber wê desteya birêvebir azad e di serastkirina çewtiyên rêzimanî û destnivîsî de.

- Ji bo nivîsên wergerandî, divê nav, sal û cihê orjînalê nivîsê bi wergerandinê re diyar bin.

- Rojname tenê bi E-mailan pê waziya nivîs û berhemên dike.

-Rojname ne berpirsyar e di ber dîtînen, bîr û boçûna nivîs û berhemên de, belê em di ber naveroka nivîs, daxuyanî û îroveyên bi navê rojnameyê derdikevin de, berpirsyar in.

-Çê nabe di nivîsan de dijûn û gotînen kirêt ji kesayetî, rêxistin, ol, komele û partiyan re bêne nivîsandin.

-Rexnegêrî divê li gor raman û pîrensîpên rexnegêrî û nivîsevaniyê bin.

-Bicîhkirina nivîsan di hundurê rojnameyê de li gor asta nivîsê û li gor mercên hunerî tê kirin.

- Emê memnûnê nivîsevanên xwe bin eger nivîsên xwe bi riya wordê wek pêvek û wêneyekî (ne di wordê de) bi înin.

-nivîs û berhemên bi kurdî li ser maila be î kurdî: kurdî.penusanu@gmail.com , bi înin.

Dubare Pênûsa Nû li we, li me û li gelê kurd pîroz be.

Tîrmeha 2012an

Desteya birêvebir a Pênûsa Nû

Ev ore û hêlanê rabîn û dirabin encama zilm û zordarîkî kevne, millet vê zordariyê nema qebûl dike ji ber ku mirin ji vê jiyane xwe tîre ev jiyana bê rehetî û tengîjî û tind û tûjî, lê tevî borîna zêdeyî salek û sê heyv li ser ore a Sûrî re çî encam daye ta niha û wê çewa bibê ?!

Çi ji me tê xwestin em weku kurd xwedî maf û netew ku li ser qada xwe dijîn di vê rew û bûyera nû de?!

1-pirbûna partiyên siyasî yên kurdî ne diyardek saxlem e, pêwîste ev nexwe î bê çarekirin da em vê derfetê ji dest xwe neberdin, nemaze di vê qûnaxa hestiyar de.

2-Pêwîste em partiyên wek hev li hevbiguncînin û bikin yek da em bikarin bîr û boçûnên xwe serhev de bînin.

3-hi yarkirina gel li ser van bûyera û rêveberiya vê qûnaxa nû berevberavekî aram û tenahî.

4-Yekbûna bîr û boçûnek kurdî û zelal kirina mafê kurdan li hember hemî gelên Sûrî.

Pêwîste em jî weku rêxistin, komele, nivîskar, helbestvan û rew enbîrî divê em yek bin û yek helwîst û nêrîn bin li hember dijîmin û neheza, û divê em li gor berpirsariya xwe ya dîrokî bin ya ku dikevê ser milê me hemiya.

Gotina yekîtiya ku em hemî bîr û baweriyê pê tînin, lê em nakin ji ber ku yekîtiya berjewenda kesên ezezî naparêze, ji ber vê yekê gelek hene li hember yekîtiyê disekinîn bê erm û fedî.

Parçebûna tevgera siyasî ya kurdî dihêle lawaz be li hember opozisyonê û her weha li hember dest hilatê jî, tevgera kurdî ya Sûrî ta niha hê nêrînek yekboyî û zelal diyar nekiryê, ji lewre dikevin hember nakokiyên mezin, nemaze di vê rew a hestiyar de ya ku hemî rew û nî anên wê pêwîst dike ku em yek dest û helwest bin. Dem hatiye neberdin rew tê guhertin. Divê em jî li gor dem û rew ê bin, yekîtiya xwe pêk bînin, nêrîn û boçûnên xwe serhevde bidin, ji ber ku berjewenda me ya herî girîng yekîtiya me ye, yekîtiya nêrîn û boçûnên me ne.

Xwe- Naskirina Neteweyî (Xekek 1)

Xwe-wendakirina Neteweyî



Dr. Ehmed Xelîl

Rastkirina ziman: Mamoste Mustefa Re îd

Mêhvanê Vê Cîhanê:

Xwenaskirin - çî di warê kesayeti de, yan di warê neteweyî de - gaveke pir giring û nirxbiha ye. Raste, dibe ku rêya xwenaskirinê dûr û dirêje be, dibe tal û tûj be, dibe ku gelek dijwar be, dibe pir bi ê - û azar be, lê tevî wê jî, xwenaskirin ronahî ye, rizgarî ye, azadî ye, serfirazî ye, rûmet û serbilindî ye, û ez dibînim ku pêxember Îsa bixwe di asta xwenaskirinê rasteqîn da bû, çaxa gotibû:

"Gelo, ma çî sûde heye, ku tu seranserê cîhanê bi dest xwe bixîni, lê tu xwe wenda bikî"?

Bê guman, xwenaskirina kesayeti û ya neteweyî ji hev ne cuda ne, herdu hevdu tewaw dikin, lê ezê niha - berî ku ronahiyê bavêjim ser qonaxên xwenaskirina xwe ya neteweyî - bi gelemperî hinekê li ser xwewendakirina xwe ya neteweyî rawestim, û di pê î da, ez bawerdikim wê ba tir be, ku piçekî - bi kurtî be jî - li ser jiyana xwe ya kesayeti bipeyivim.

Di sala 1945-an da ez - bê hemdî xwe - bûm mêhvanê vê cîhanê; li gundê Korzêlê, devera Efrîn, ya ku li roavayê Kurdistanê dikeve (bakur roavayê Sûriyê). Ji aliyê dê, dapîr, bav û bapîr ve, ez kurdekî resenim, reh û rê fîyên malbata me digihînin yekîtiya êlên Berazan, êla Dinan. Ev êl ji binyata xwe de Ezdahî ne (êzîdî ne), belkî ji dused sal de, hinek ji axên wê, di bin zor û xapandinê de, bûne misilman, û axên din heya niha jî li ser ola xwe ya resen mane; piraniya wan li devra engalê ne. Belê, min ev ti t ji ciwaniya xwe de dizanî, çimkê pir caran min ji bapîrê xwe em, bavê xwe Mehmûd û apê xwe Elî (cihê wan bihû t be) ev ti t dibihîst.

Gundê Me:

Rûni tivanên gundê me - wek yên hemû gundên devera Efrîn - bi zaravayê kurmancî diaxivin, me hemiya dizanî ku em kurdin, ne Tirk û ne Erebin; û pirêcaran hinek ji gundiyan me, dema ku zor li wan dihat kirin, bi protestoyî digotin, "ma qey em Tat û Erebin"?! û me dizanî ku cil, saz, mûzîk û bazdanên (sema) me yên kurda ne. Ji vê wêdatir me ti ti t ji kurdayetiye nedizanî; ev pergala me bû berî dehsalên êstî ji sedsala bîstan, û ez kanim bibêjim, ku ew dem - ji aliyê kurdayetiye ve - dema nelivîyê û pêngaviyê bû.

Ji destpêka dehsalên êstî de, piçek pê daçûn di hi yariya me ya kurdayetiye de pêkhat. Hinek mirovên gundê me - car caran- çêra Berzaniyê nemir dikirin, û bi navê (Bavê kal) binav dikirin, û wisa bi wî pozê xwe bilind dikirin. Wê çaxê li gundê meyî ku ji nêzik sed malî pêkdihat, yek mal Tat û du malên Erebin hebûn; ew ciwêleg bûn, ivantî û kar û barên din dikirin. Di havîna sala 1963-an, dema ku Partiya Be is destelata Sûriyê bi dest xwe ve anî, yek ji kurrên wan ereban be isî bû, û dora pênc camêran ji gundê me - yek ji wan xalê min Evdo û xalê min ukrî bû - li pê wî kurrikê ereb pesna Berzaniyê nemir dan û gotin: Em Berzanî ne. Roja din, hema ji ni ka va ragehêneran ew girtin û birin Efrîn, û li wir ew dane ber kotek, qamçe û î kenceyên giran.

Erê, ez kanim bibêjim, ku gundê me, di dehsalên êstî de, ji hi yariya kurdayatiyê ne rijî bû, lê bi rengekî sivik û sade û sereveyî, ne bi rengekî ramanî, zanistî, ramiyarî û partîzanî, di vê babetê de xelkê gundê me ne gihi tibû astake bilind, wek asta dehsalên he tîyî û bi jor de. Êdî ka ez werim ser rew a xwe ya xwe-wenakirina neteweyî.

Binemala Me:

Ez bixwe di maleke oldar de mezin

bûm. Bavê min mele bû, wî ez li ser rêbaz û rêzikên ola Islami perwerde kirim, ne bes ji aliyê nimêj, avdaz, rojî û xwendina Quranê, lê herweha - û bi asteka hi k - ji aliyê sincî de jî, nedihî t ku ez dostaniyê bi hemû kesî re bikim. Tirs a wî tim û tim ew bû, ku ez hînî ti tîn neba, yên wek ki andina cigarê, vexwendina meyê û listîka qumarê bibim. Mixabin ev sê ti tîn han, di wê demê de, di nav gundê me, û di nav pir gundên devera me de, cihê xwe girtibûn, û bibûn nexwe iyeke pir xirab. Ev êweyê ku bavê min (cihê wî bihû t be) ez pê perwerde kirim, kir ku ez bi radeyeka bilind li xwe werime hev, û pêwendiyên min bi xelkê ku ez di nav wan de - li hemû cih û welatan - pir kê m be. Heya niha jî, ev sinciya han di kesayetiya min da cihê xwe girtiye. Vê xwe-lihevpeçanê û xwe-bitenêbûnê kir ku ez berê xwe bidim pirtûkan. Erê, hevalên min yên herdem, ji çarde-panzde saliyê de, pirtûk bûn; çîrok, roman, helbst, û hwd, lê mixabin min ti ti t li ser kurdayetiye di wan pirtûkan de nedidî; ji ber ku hemû pirtûkên ku pêwendiya wan bi Kurd û kurdayetiye ra hebûn li Sûriyê bi fermî qedexe bûn, û rew di dezgehên agahdariyê de jî wisa bû; û rew heya niha jî hên wisa ye.

Vêca ez kanim bibêjim, ku di ciwaniya min de pirtûkan ti pencere di werê kurdayetiye de li pê min venekirin, lê gengazî hebû, ku ew pencere bi rêya partiyên kurdan ji min re vebibûya, lê dîsa mixabin ti kesî xwe negihande min, û çavên min li ser rew a Kurd û kurdayetiye bi ronahî nekirin. Dibe ku sedema yekemîn - wek min berê jî got - xwe-lihevpeçana min bû, û sedema duyemîn jî mêldariya min a olî bû, ji ber ku partiyên kurdên Sûriyê xwe bi ser çepiyê de pal didan, û ez kanim bêjim ku li dijî olperestiye bûn, bi olperestan re digotin (Sofi); û tê bîra min, li dor sala 1985-an ez li cem dostekî partîzan rûn tibûm, di pêra hevlekî wî yî partîzan ji devera Cizîrê bû mêhvanê wî, rabû dostê min ez pê dam naskirin û got: Mamoste Ahmed Sofî ye.

Bi rastî vê danasîne ez hinekî veciniqandim, ji ber ku têrma (Sofi), di nerîna gelek partîzanên kurdên Sûriyê de, wateya (pa verû) dida. Raste, ku ez wê demê oldar bûm, lê tenê di çarçewa nimêjkirin, rojgirtin û sinciyen de, ne ji aliyê rêbazî da. Ango ez (oldar) bûm, ne (olperest) bûm, dostên min nedizanîbû ku perwerdeya min ya olî, di bin seywana bavê min de, ne bi rengekî tundrû bû. Hên di zarotiya xwe de, min pir caran didî, çawa ku bavê min bi rêzdarî pêwendî bi dostên xwe ên Ermenî, Êzdî û îfî (Imamî) re dihûnan, û mêhvanên me ji xwediyên van ol û rêbazan hebûn. Bi kurtahî, bavê min ji aliyê olî de misilman bû, lê ji aliyê piraktîkî de global bû; û Ez jî bi vê felsefeyê perwerde bûm.

dralkhalil@hotmail.com

Qelemnâme



Ho eng Osê

Nivîs û Helbest û Siyaset!

Têgîneke a heye, dibêje: kî di mijarên siyasî de dinivîsîne, siyastmedar e!. Mijûlbûna bi siyasetê, bûye mercek ji mercên jiyana me aKurdan. Ne ji ber ku em pir ji siyasytê hez dikin, lê ji ber rew a awarte ku emtêde dijîn. Welat qedexe, ziman qedexe, nasname qedexe, hiner, peyv, çande...tev qedexe. Di gel vê, dijminê jiyana û hebûna me, ji me re dibêje: 'hun tune ne'!. Vêja, dê çawa Kurdo, xwe durrî siyasetê bike. !

Jiyana me û rew a em tede dijîn, em mecbûr dikin kupeywendiyên me bi siyasetê hebe, ne weku siyastvan, lê weku nivîskar, ravekar,rew enbîr û dahêner. Ez ji siyasetê qet hez na kim!. Lê rew a gel û welatê me,min mecbûr kiriye ku ser mijar û babet û bûyerên siyasî binivîsînim, weke irove û rexne, da hin pirsyanan bilivînim û hin metirsiyanan bidin naskirin û lizingilê hi yariyê bidim, di gel ku civakê ber bi hi mendiyêke 'zihniyeteke' rexnegêrî ve bajom.

Helbet, siyast û wêje, ji hev cuda ne tenê ji aliyê êweyê hûnandin û derbirînê, lê ji aliyê hest, xeyal u ramanan jî. Ango, êweyê.Tu dikarî bi êweyê wêjeyî 'Edebî' hin mijarên siyasî derbirîn û bîni ziman.Mînak, komkujiyên Dersim, Halebçe û Qami lo yê... encama rew û helwest ûplaneke kirêt a siyasî bûn, lê mirov dikare li ser van komkujiyayan binivîsîne nebi zimanê siyasetê. Lewra, eger radeya zimanê siyasetê di têkstên wêjeyî bilindbe, teqez 'ekîd' dê ser hesabê nizimbûna hinera kûrbûna têkstê be. Bi sedan,wêjevan û helbstvanên navnetewî yên navdar hene ku siyastmedar bûn, wekehelbstvanê îlî Paplo Nîroda (1904 - 1972) û helbstvanê Turk Nazim Hikmet(1902 - 1962)...HWD. Lê dibe ku niha Nîroda û Hikmet sax bana û bijyana dibe kuli ser mijarên siyasî ne nivîsandana. Dêmek rew a gel, civak û welatên wan, wanmejbûr dikir ku bi mijar û bûyerên siyasî bimûl bibin, lê bi zimanê wêjeyî nebi zimanê siyaste. Helbest jî, eger bi zimanê siyasetê were nivîsandin, nemadibe helbest, lê dibe raport, daxwiyân... an ti teke din, lê teqez ne helbeste. Ji ber ku dê têkst tijî duru m û qerebalix û xirecira siyasetê be .

her qûnaxeke ji jiyana gel, civak û welatan, bi xewre, êweke taybet ji wêje, edeb,derdibirîne. Çiqas helbest, xwe durrî zimanê siyasetê yê dîreket, rasterast,bike, ewqas temen dirêj dibe. Lewma, helbesta 'Kîme ez' a Cegerxîn, niha nemamirov dikare wê dixwîne. Lê helbestên Cizîrî, heta roja qiyamete jî, herûher dê bijîn. Berê jî pê merge - gerillahebûn, niha jî hene. Berê pê merge helbest binivîsandin, lê bi zimanê tîfingê,tijî bang, qêrîn, hawar, firyad, hêrs û morala tevdana têko in û serhildan ûhi yariya netewayî û ore gerî bûn. Lê niha, divê pê merge - gerilla, bi hestekenazik û zimanêke nazikîr binivîsîne. Divê helbestvan, nasbike ku helbest, jî tîfingê jî xurttir e, dema xwe berdide nava xwîn, giyan, hest û xeyalênmirovani!. dema ku pênûs li gorî fehenga hest û xeyal û ramanên nepenî bilive,ne li gorî ferhenga tîfingê biçê, dê hinera 'sihr û mecazê' biteqe û bi lemelembiherike.!. Helbest, ne daxwiyaneke siyasî, yan jî alavekedîrokvanî ye!. helbest, pencerya giyan, xeyal, raman û pirsên hebûnî ye!.Helbest, êweyê herî girîng ji êweyên dermankirina giyanê ye. Carna,nivîsandina helbestê, weke vexwarina fîncana qehwê a serê sibehê ye, lêxwendina wê, her tim, weke xwendina fala fîncana qehwê ye. Çiqas nepenî be,ewqas xwe e û pirsan di mejî, dil, giyan û xeyanên me de dilivîne.

Helbestvan, dojeheke dijî, da buhu tekê diyarîme dike. Helbest, vewstgeha 'îstîrahet' mejî ye û meydana cirîda hespên giyan ûxeyalan e. Ez jî dinivîsînim, ji bo pak û paqij bibim. Helbestêdinivîsînim, ji bo ku, ne xwe, ne jî keseke din bikujim.

jiyan bê helbest dibe goristan. Dema ku hewldêrênhelbestê kê m dibim, dêmek civak nexwe e, jehrî bûye, ber bi mirinê diçe!. Yaku dihêle jiyan mêdar be û mêdar bimîne, helbest e. civaka bê helbest, miletekebê giyan û xeyal e!. min berê got: 'helbest, derbirîna stîrês, xewn û xeyal,hizir û raman, ê , janên û ikestinên kesayeti û civakê ye'. lewman, egerhelbest ji jiyana miletan û civakan derkeve, dê mirov hev bixwin. Erger Cizîrî,Xanî, Nalî, Herîrî, Bêkes, Goran, Cegerxwîn... helbestê ne nivîsandana, yan xweyan keseke din, dê biku tana!. Ji ber kuhelbestvan, nexwe in û tenê nivîsandina helbestê, demanê wan e.

Ez hej ji helbest, jiyan, welat, mirovahî û hemûnîrxên bedewbûn, çelengî û evîne dikim.

Bi nerîna min, gerek helbestvan, ji helbestênxwe hez neke, da karibe yên we iktir biafirîne. Erger helbestvan bibe a iqêberhemên xwe, dêmek nema dikare xwe nûbike. Dêmek xwe dubare dike, ji ber ku ji xwe re ban û sînoran datîne.

Her helbestvanek, rengeke, janeke, ê eke, xewneke,nameyêke, hêviyêke, ikestinêke, peyameke, çêjeke, tameke. Her yek ji wan, bejneke. Heryek ji wan, be eke ji dîmena helbesta Kurdî. Û helbet, her yek ji wan, helbestên wî yên xwe û yên nexwe hene.!

KURT Û
KURMANCÎ

Ho eng Broka

Zimanê „zirbav“ û pirsî nivîsandinê

Pirsî zimanê „zirbav“ li vir, bê guman, ne pirsî her zimanekî, her pirtûkekê û her nivîskarekî ye. Ew pirsî ê dar, a navbera du zimanan, du siyaseta, du cîyografî, du dîrok, du çîrok, du bîr, du bawerî û du mirovan e: Mirovek fêrmî, a kere û serdest e, yê din jî qedaxê, bi dizî û bindest e.

Di rew eke qedaxê, wek a Kurdan de, ku di rabûnûnî tina wan de, ji malê heta bi dibistan û kolanê, zimanek bilind, sipî, bi desthilat û serdar e, û yek jî nizim, re , jêzror û bindar e, aya mirov çawa dikare basa Kurdî, wek „zimanê dê“, bike Çawa mirov dikare basa Kurdî, wek zimanê xwendin, nivîsandin, danûstandin, lixwe û –lihevnikurhatin, bîrkerin û bêrîkerin, derbirin û hestkerinê, bike

Di rew eke weha qedaxê de, ne ziman êdî yê dayîkê ye, ne jî zarokên wî zimanî dikarin, bibin zimanê dayîka xwe.

Ne zimanê dayîkê êdî hesan e, ne jî zarok dikarin hesan bibin zimanê xwe.

Ne xwendin û nivîsandin bi zimanê dayîkê dikarin hi in û êrn bin, ne jî zarok dikarin bibin êrnên xwendin û nivîsandinê.

Mirov zimanê xwe ye, ziman jî mirovê xwe ye. Kî ziman ji dest dide, ew ji dest xwe diçe, kî ziman bi dest dixê, ew bi destên xwe dibe.

Ev rastiya ziman di mirov de, û herweha mirov jî di ziman de, ji hêla „aqilê dagîrker“ ve, ji mêj de, hatiye naskirin û famkirinê.

Di pirtûka xwe ya bi sernavê „Dagîrkirina Amerîka: pirsî yê din“ de (La conquête de l'Amérique : la question de l'autre, 1982), filosofê Fransî ê Bulgarîzade Tzvetan Todorov, vî aqilê ji dagîrkariyê, dîrok û dîrok, di gavên Christoph Kolombus (1451-1506) û defter û bîranînên wî de, bi hûrgulî analîze dike.

Todorov weha Amerîka „nûdîtî“ (nûke ifkîrî) di gavên Kolombus de, irove dike: „Binavkirina ti tan tê wateya tapokirina wan. Yekemîn kiriyara Kolombus di Amerîka nûke ifkîrî de, binavkirina ti tan û cihan bû. Ev binavkirin amajeya tapokirînê bû, ku êdî pê re, Amerîka dibû milkê Ispanyayê (...) ji Kolombus re, mirov jî di rêza cihan, dar û beran û çivîkan de, dihatin dîtin. Her ti t ji nuh ve, dihat binavkirinê (...) Dagîrkariya materialîst, hem serenacm hem jî sedem û mercê dagîrkariya rûhî û îdealîst e. Kolombus weha ev herdu kiryar dibirin terazûkirin û cihbicihkirinê: Ispaniyana dîn û bawerî didan, lê zêr distandin.“

Weha „Amerîka kevn“, pi tî binavkirina nuh, bû „Amerîka nuh“, û xelk û xwedanên wê yên dêrîn, xanedan û kevnare jî, bi ax û ava xwe, dar û ber û çivîkên xwe re, neman yên xwe, belê bûn yên „Amerîkiyên nuh“, anku „Amerîkiyên Kolombus.“

Pi tî dora 519 salan ji mantiqê „aqilê dagîrker“, ku yekemîn car Amerîka bir „binavkirina nuh“, îroj Kurd li seranserî aliyên xwe yên qedaxê, hîn bi heman aqilî, heman mantiq û heman dagîrkariyê, diçin heman „binavkirina nuh“, ku di serencamê de, tapokirin e: Carekê bi Erebi, duwê bi Tirkî, ya sêyemîn jî bi farisî.

Lewma Qami lo, Dêrik, Tirbespî û Kûbanê bûn Qami li, Malikiyê, Qehtaniyê û Eyn-Elereb û Kurdên wan jî bûn „ecnebî“ û „mektûm“, anku „xerîbên nenas“, „hemwelatîyên dawîya welat“ û „welatîyên bê welat.“

Lewma, Helepçe di Kîmyabaranê hate werkirin, û Kurdên Kurdistana wê, kom bi kom, hatin tesfîyêkirin û enfalkirinê.

Lewma, Amed bû „Diyarbekir“ û Kurdên wê jî bûn „Triken çîya.“

Lewma, Mehabad bû meydana sêdarkirina Kurdan, û Kurdên wê jî beramberî „Ayetullahên Tehranê“, bûn „Kurdên eytan.“

Binavkirina yê din, bi zimanekî din, di dawiyê de, dagîrkirin û tapokirin e.

Di atmosfêrekî weha de, ku ne Kurd êdî yên xwe ne, ne jî welatê wan yê wan e; ne Kurd, a kere, dikarin bibin Kurdiya xwe, ne jî Kurdiya wan dikare bibe ya wan, ku her ti t û her kes, di aliyên wan yên bi Kurdî de, bi „zimanên xerîb“ (zimanên yên din), hatine binavkirinê, Kurdî êdî nema zimanê dê, belkû yê „jinbavê“ û „cêyê“ ye.

Di serencama „binavkirina nuh“ de, ku her ti tî bi Kurdî wek her Kurdekî, ji nuh ve, bi zimanên yên din, tê polîtîzekirin, dîrokkirin, cîyografîkirin, cihbicihkirin, dorpêçkirin û tapokirinê, êdî ne Kurdî dikare tîra Kurdên xwe bike, ne jî Kurd dikarin tîra Kurdiya xwe bikin.

Li jêr kartêkirina proseseke weha de, ku welatek; ax û ava wî, xwedî, xelk û xwedanên wî, erd û asmanê wî, rabûnûrûnî tina wî, bîr û baweriya wî, aqil, bîrewerî û hestyariya wî, bîrkerin û bêrîkerina wî, tev di rihê zimanekî din, yê nuh û xerîb de, tîr kirsaguhêrandinê, êdî pirsî xwendin û nivîsandina bi Kurdî, ji pirsî bi „zimanê dê“ bihtir, xwe wek pirsî bi „zimanê zirbav“, derdixê pê.

Ne ji ber ku „zimanê zirbav“ ji „zimanê dê“ êrîntir, mezintir û bilindtir e... Nexêr. Belê ji ber ku ew wek zimanekî hazir, berdest û rewî, hesantir, zûtir û belavetir e:

Ew hesan, zû û belav e, ji ber ku ew zimanê li her derê a kere, hêzê û dewletê ye, lê Kurdî zimanê bidizî, bêtaqetî û muxalefetê ye.

Di rew eke weha wek a Kurdan de, ku zimanê dê, li seranserî aliyên wan, yên sînor û sînor qedaxê, ne zimanê dibistan, pirtûk, rojname, siyaseta, bîr û bawerî, aborî, kultûr û rabûnûrûnî tinê ye, helbet ne

hesan e, ku Kurdî wek derbirin, bibe zimanê xwendin û nivîsandinê

Dema ku mirov bi „zimanekî zirbav“, diçe xwendin, nivîsandin, perwerdekirin û danûstandinê, helbet dê zimanê dayîkê, ne tenê zehmet, zor û giran be, belkû ew dê „ermoke“, „bixwenebawer“, „seqet“ û „dereng“ jî be.

Pirrcaran Kurdên bi „zimanê zirbav“, ku mecbûrî xwendin û nivîsandina li jêr qedera wî ne, ji xwe pirsî dikin, yan jî ji wan tê pirsîyarkirinê: Em çima bi vî zimanî dixwînin û dinivîsin

Çima em xwe di vî zimanê qedere de, ku li ser me hatiye kilîtkirinê, asê dikin

Çima em zimanê dayîkê dibêjin, lê di parafîkê de, „zimanê zirbav“ dipêjin

Bê guman bersiva van pirsîyan û gelek pirsîyan din, bi mantiqekî yekalî, nikare were dayîn.

Enacam, belkî yek be, ku ew jî „havîbûna ji zimanê dê“ ye, lê teqez, sedem û faktor pîr in.

Ji bo nirxandina diyardeya xwendin û nivîsandina bi zimanê yên din, gelek teorî, irove, analîze û nerînên cuda cuda, hene.

Ziman, li ser asta duwalîzma „Ez/ Ew“, parek ji milk û mewdanê mirov e. Naxwe ziman xwediyê xwe ye. Weha, Fransî ya Fransa û Fransiyana, Kurdî a Kurdan, Tirkî a Tirkan, Erebi a Ereban û Farisî jî a Farisan e.

Analîzeyên Todorov, yên di derbareyê „dagîrkirina Amerîkayê“ û pirsî yên din“ de, ku min li jor destnî an kirine, xwe bi giranî dispêrin vê teorîyê, ku hemî dagîrkeran bi kilîta wê, „welatên nuh“, „gelên nuh“ û „kultûrên nuh“, vekirine, yan jî dane vekirîne.

Kilîta „nûvekirina“ welatekî nuh, cîyografî, dîrok û herweha mirovekî nuh, di serî de, „jinuhvebinavkirin“ e.

Bi vî awayî, „aqilê dagîrker“ hemî hewldanên xwe dike, daku bi „navê nuh“ (binavkirina nuh), nav û binavkirinê kevin, bi cihan, deman, mirovan, dar û beran, erdê û asmanan, bide jîbîrkirinê. Ev mantiq dibêje, pi tî „binavkirina nuh“, ne „kevin“, ne „berî“, ne „hebû“, ne „tê bîra min“, ne jî „xwezî“ heye... Her ti t, ji nuh de, dest pê dike.

Pi tî binavkirina nuh, ku êdî her ti t, bi zimanê nuh, milk û sermiyanê xwediyên wî ye, tenê navên nuh, dîrok û cîyografiya nuh, bîra nuh, baweriya nuh, Xwedayê nuh, mirovê nuh... û „gelê nuh“, hene.

Pi tî „dagîrkirina nuh“, ku navê zimanekî nuh e, êdî „berî“ tune ye (yan jî nabe ku hebe), tenê „pi tî“, heye.

Dîroka Amerîka îro roj, dîroka „pi tî“ Kolombus e.

Tirkiya, Îran û Sûrya îro roj jî (wek Îraqa berî 2003an) ji bo Kurdên wan, kêm-zêde, dubarekirina heman mantiq û hamen dîroka ji dagîrkariyê ye.

Kurd, li van welatan, li gorî binavkirina bi Tirkî, Farisî û Erebi, ne Kurdên Kurdî û Kurdistana xwe ne, belê ew Tirk, Faris û Ereben „pi tî“ Tirkiyê, Sûriyê û Îranê ne.

Di atmosfêrekî weha dagîrkerane de, ku „zimanê dê“ li ser ax û ava xwe, diçe ava û xwediyên wî bo zimanekî din î xerîb û weletekî xerîb, bi darê zorê tîr koçberkirinê, wê çaxê pirsî zimanê dê, ku di „zimanekî zirbav“ de, hatiye windakirin û talankirinê, wek pirsî bêrîkerin, xwedîlêderketin, xîret û jinuhvezindîkirinê, derdixê pê û xwe pêwîst dike.

Pirsî ziman, li vir, ji pirsîke dahênane bihtir, êdî ew pirsîke siyasî ye.

Ew pirsî di navbera du zimanan de ye: Li hêlekê zimanê dê, yê jinavçûyî, jîbîrkirin û bêrîkerinê. Li hêla din jî, zimanê binavkirin, bîrkerin, hînkerin, jinavbirin û dagîrkirinê.

Lewma pirrcaran, diyardeya xwendin û nivîsandina bi zimanê zirbav, bi Kurdî, li ser vî astê, wek „xiyanet û xinîziyê“, tê liqelemdanê.

Helbet, ev diyarde, ne tenê bi Kurdî ye.

Pareke ne hindik ji rew enbîrên Erebi li Cezayir, Maroko û Tûnis bi heman mantiqê, nivîskarên xwe yên bi Fransî, dibin heman „tawan“ û heman „xiyanetê.“

Nivîskarê Çînî, yê bi Ingilîzî navdar Ha Jin, ku di sala 1985an de, koçî Emerîka kiriye, dikare li vir, wek sembola herî xwe ik, a vî „xiyaneta dahênane“, were xwendin û destnî ankirinê.

Jin, di pirtûka xwe ya bi navê „nivîskarê koçber“ de (2008), dibêje: „xiyanet ne ew e, ku mirov ji welatê xwe koçber bibe, belê xiyaneta mezin ew e, ku mirov bi zimanekî din, nivîsandinê hilbijêre.“

Jin tîgeha xiyanetê weha bi berdeyamî, irove dike:

„Di dîrokê de, her tim takekes bi xiyaneta welatê xwe hatiye tawanbarkirinê, çima êdî em wekî din nabêjin û dewletê bixwe tawanbar nakin, ku ew her roj xiyaneta mezin li welatîyê takekes dike“

Jin, li xwe mikur tê, ku „xiyaneta mezin“ li zimanê diya xwe kiriye, lê ya hi tiye ku ew li vî „xiyaneta zimanewî“, siwar bibe û herweha mezin tîwerbibe, ne ew yê takekes, belê dewleta Çînî bi xwe ye, ku rê nade nivîskar û dahênerên wekî wî, ku bi zimanê dayîka xwe, wekî xwe, bi azadiya xwe, herin nivîsanidin û derbibirîne.

Wate, pêwîstiya xwendin û nivîsandina bi zimanê dayîkê, ji pêwîstiya azadiyê tê.

Li ser asta vî xiyaneta bi Kurdî mezin, Selîm Berakatê Kurd, ku yek ji ba tirîn nivîskarên Erebiya îro roj e, naxwe „xayînekî“ wek Jin, xwe ik û mezin e.

Helbet, Berakat bilind hest dike, ku Kurdî zelaltirîn rêza rihê wî ye, herwekî çawa ew berê herî zelal yê zimanê dayîka wî ye, lê ligel vî hestyariya bilind, ew rihê xwe, pirtûk û pirtûk, bi Erebi derdibire, û herweha Erebiyê jî wek „welatê xwe, yê ji nivîsandinê“, li qelem dide.

Ji ber nivîskariya Berakat a bi Erebi bilind, helbestvanê Filestînî yê navdar, Mehmûd Derwî (1941-2008), ew wek „ba tirîn nivîskarê bi Erebi di van herdu dehsalên dawiyê de“ û wek „dagîrkerê dîmena helbesta Erebi û bavê gelek helbestvanan“, bi nav kiriye.

Pirsî ku li vir, her nivîsandin û xwendina bi Kurdî, dikare were kirinê ev e:

Gelo çima nivîskarekî wek Selîm Berakat weha mezin, bi Kurdî nanivîse; bi Kurdî nabe bevê helbest û edebiyata Kurdî a tazeger û bi Kurdî nabe „neqa“ û nîgarkê ê Kurmanciyê

Ev pirsî bi qasî ku pîr e, bersiv dikare pîrtir be; bi qasî ku biê e, bersiv dikare ê dartir be; bi qasî ku sext û dijwar e, bersiv dikare sexttir û dijwartir be.

Bi zimanê Jin, naxwe Berakat ba tirîn, mezintirîn, bilindtirîn û herweha xwe iktirîn „xayîne“ Kurmanciyê ye.




Lê, berî ku em ji Berakat û destûbîrakên wî, yên Kurmanc, bipîrsin, çima û çawa ew ne nivîskarên zimanê dayîka xwe ne, gereke em bipîrsin, çima û ji ber çî, wan bi zimanên din, „xiyaneta mezin“ li Kurmanciya xwe, kirine

Pîrs li vir, ne kî „xiyaneta mezin“ li zimanê dê dikê ye, belê kî wê xiyanetê, ziman û ziman, bixwe çê dike, dide çêkirin û mecbûrkirinê

Yan em wek takekes, dê bi zimanên xerîb û „zirbav“ bibin „xayîn“, yan jî gereke em „dewletên xayîn“, ku azadiyê pirtûk û pirtûk dikuvin, bi zimanê diya xwe, bibin mehkûmkirin, tawanbarkirin û darizandinê!

Kurtedîroka alfabên ku kurdan bikaranîne


Celadet Çeliker




Bê ik, Kurdan, berî ku bi pîrsa alfaba Latîni bilî bibin, çend alfabên din jî bikaranîne. Kurdan kengê dest bi bikaranîna alfabê kirine, mixabin hêj derneketiye ronahiye û ev pîrs li hêviya lêkolînên zimanzan û dîroknasên Kurdan e. Gava ji bal pîraniya dîroknas û Kurdnasan ve tê pejirandin ku, Medî bapîrên gelê Kurd in, wê demê diyê em lê bigerin ka Mediyân çi alfabe bikaranîne. Gelek nivîskar, li ser aristanî û medeniyeta Medya he metkar mane. Ew qala kitêbxanên gelek mezin ên welatê Mediyân dikin. Li gor E.M. Diakonov, cûreki tîpên mîxî (Bizmarî) bi riya Mediyân derbasî Farisiya kevn bûye. Ew di wê baweriyê de ye ku, Mediyân ew alfabe ji Ûrartûyan girtiye(1) Sêniyek zîvîn, ku li gor texmînan, ji sedsala he tan a B.Z. (Berî zayîna Isa) ye û ji dema Mediyân maye, li Zêwe (Kurdîstana Rojhilat) hatiye dîtin. Li ser vê sêniyê ev cûre tîpên Bizmarî hene: Lê mixabin tu keleporek din a bi van tîpan nivîsandî, ji dema Mediya heta niha ne hatiye dîtin. Dîroknivîsê Grekî Herodot, gava di salên 450 yên B.Z. de diçe welatê Mediyân, dinivîse ku, pi tî tîkçûna dewleta Mediya, hemî ti tînan ku wan afirandibûn ji alê Dewleta Pers ve hatibûn talankirin û wêrankirin.(2) Alfaba Bizmarî 36 tîp e; Li gor Heme Teqî Bihar, Mediyân e tîp li vê alfabê zêde kirine û bi çil û du tîpan bikaranîne. ikil û awayên van tîpan bi vi awayî, ne:(3)

Nivîsa bi tîpên Aramî hatiye nivîsandin. Li gor Gîv Mûkriyanî, ev kitêba herî kevn a bi zimanê Kurdî hatiye nivîsandin. Tîpên alfaba Pehlewîya Kevn bi vi awayî ne.(8)

Wisa dixwiye ku, Kurdan alfabeke taybetî ji xwe re afirandine û ev berî û pi tî pejirandina îslamê jî bikaranîne. Li gor kitêba nivîskarê Ereb, İbnî



Gava em vê nivîsa li jor, tîp bi tîp ji olfjba Ezidiyan veguhêzin a Latîniya Kurdî, ew dibe bi vî awayî:



ina Bav
Lo bavo, lo bavo, lo bavo
Bavo çima felekê ha kir
Felekê serê xwe li min ba kir,
bavê min miri ye, mala min xirav kir.

Bavo, min belengazî min sefilî min sergerdan.
Bavê min miriye ez bûme sefil.
Bavo bavî tî tekt çê ye,
kurtî bavî zînet a rû 'erdê ye,
bavo cînet cehnem destê Xwedê ye.
Bavo te yekê ne çê kir,
te mala xwe ji mala min cihê kir."

Pi tî pejirandina îslamê, hêdî hêdî bi riya ola îslamê alfaba Erebî di nav Kurdan de belav bû. air û nivîskarên Kurd ên klasîk, wek Elî Herîrî, Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Melayê Batê, Ahmedê Xanî, û hwd. berhemên xwe bi vê alfaba Erebî dane. Alfaba Erebî li gor dengên ku di zimanên

semîtîkî de hene, nikanibûye bersiva dengên zimanê Kurdî bide. Kurdan jî wek Farisan bi guhertinên li ser hinek tîpên alfaba Erebî, ji bo çend den-gên xas ên zimanê xwe, tîpên nû çêkirine. Wisa dixwiye ku, Kurdan alfa-ba Farisî ya bi tîpên Erebî, ji bo zimanê xwe mînak girtine. Alfaba Erebî ya eslî bi vî awayî ye:


Wek diyar e, di vê alfabê de, dengên Kurdî "g"p "ç"ê "j"i "û", "v" nayên ni an kirin. Ji bilî dengê "i", bi guhertina tîpa alfaba Erebî ()-() "g", bi guhertina ()-() "p", bi guhertina ()-() "ç" bi ya ()-()

"ê", bi gutiertina ()-() "j" û bi ya () jî () "v" hatiye çêkirin.

2. ALFABA KURDÎ YA LATÎNÎ


Wek tê zanîn, alfaba Latîni ev nêzikî 2700 sal in, ku kêm zêde ji alê hi-nek nelkan ve hatiye bikaranîn. Di nav salan de bi guhertinên siyasî yên li Rojhilata Navîn -ku li ser civata gelê Kurd tesir kirine-, wisa dixwiye ku bi kêmasî haya Kurdan ji e alfaban hebûye û bi ihtimalek mezin jî, ew alfabe bikar anîne (Alfaba Bizmarî, ya Pehlewî ya kevn, a Awestî, ya Masî Soratî, Alfaba Ezidiyan, a Erebî). Lê belê heta destpêka vê sedsalê, di nav Kurdan de li ser guhertina alfaba Erebî bi ya Latîni, em tu gotûbêjan nabînin. Wan bi sedan salan bi alfabên cihê nivîsîne, ku li gor hinek dîroknas û zimanzanan, hinek ji wan alfaban ên Kurdan bi xwe bûne. Gelo, çima Kurdan di destpêka vê sedsalê de hewce dîtine ku alfaba Kurdî ya bi tîpên Erebî bi ya Latîni biguhêzin?

Bi dîtina min, sedemên serekî yên ji bo vê guheztinê ev in: Di van du sedsalên dawiyê de, di warê teknoloji û endustriyê de, di warê siyaseta dinyayê û zanistiyê de,



alfabeya bizmarî bi tevî çî tîpên ku Mediyân lê zêde kirine

Li welatê Mediyân û li yê Farisên kevn, ji bilî alfaba Bizmarî "Alfaba Awestî" jî hatiye bikaranîn. Hinek dîtin hene ku dibêjin Awesta, kitêba pîroza ola Zerde ti, bi zimanê Mediya hatî nivîsandin. Yek ji wan dîroknas û rojhilatnasên ku vê dîtinê didin pês., Minorskî ye(4) "Alfaba Awesta-yî" ji milê rastê ber ve nilê çepê dihat nivîsandin û ji çil û çar tîpan pêk dihat Di hinek çavkaniyan de, ev hejmar cil û he t tî nî andan.(5) Ev alfabe bi "zêr û zibe" û bi vî tehrî tî nî an kirin.(6)




Heke em Awestayê bidin alîkî, bi qasî heta niha tê zanîn, alfaba herî kevn a ku hinek ti tînan bi zimanê Kurdî pê hatine nivîsandin, alfaba Aramî ye. Hinek wesîqên ku di destpêka vê sedsalê de, di hinek ikevîtan li herêma Hewraman de hatine dîtin, ji alê hinek kesan ve nivîsên herî kevn ên Kurdî tînan hesibandin û ew bi alfaba Aramî hatine nivîsandin. Ew nivîs li ser çermên xezalan hatine nivîsandin û di derheqê jîyan û bazirganiya wan rojan de ne. Ji van nivîsan a herî kevn, ji salên 88-87 ên B.Z. ne.(7)

Bi alfaba Pehlewîya Kevn, bi navê "Dînkêrd", kitêbek bi zaravayê Lorî

Weh iye, ku kitêba xwe di sala 241 ê Hicrî de (856ê B.Z. ?) nivîsiye, pîraniya Kurdan wê demê nivîsên xwe bi xetên "Masî Soratî" dinivîsîn. Nivîskar bi xwe se berg (cîl) kitêbên Kurdî yên bi vê alfabê nivîsandî dîtine. Di vê alfabê de e deng hene ku dengên wan di alfaba Erebî de tunenin, wek dengên "p" û "ç". Ev alfabe ji sîh û heft tîpên hevedudanî ye. iklên tîpên vê alfabê bi vî awayî ne.(9)

Di "Ferhenga Khurdî-Tirkî" ya sala 1967 an de, Musa Anter tîpên vê al-fabê datîne û dibêje, Kurdan berî îslamê ev alfaba xwe bikar dianîn.(10) Li



gor êx Muhamed Merdûxî Kurdistani, ew tîpên ku li miqabilê wan di al-faba Erebî de tu tîp tunebûn, dibe ku miqabilê van dengên zimanê Kurdî bin: ç, "p", "j", "g", "11", "o".(11) Disa li gor êx M.M. Kurdistani, "Di sedsala deha ya B.Z. de mirovek bi navê Masî Soratî peyda bû. Wî li gor tîpên ebcêdî çend tîpên din çêkirin ku bi navê tîpên Masî Soratî hatin naskirin, bi wan tîpan ti tî hatine nivîsandin û li ser wan gotûbêj hatine kirin. Ew tîp di ibin tîpên ku di sedsala e an de bi navê "pestî Awesta" dihatin naskirin... Heta nêzîka destpêka hatina dînê îslamê, tîpên Masî Soratî di nav Kurdan de hatine bikaranîn û di gel wê jî, xetên Aramî, Sîriyanî û Grekî jî hatine bikaranîn".C12)

Di nav Kurdên Ezidî de bi sedan sal in, ku alfabeke taybetî tê bikaranîn. Ji vê alfabê re hinek dibêjin "Alfaba Ezidiyan". Kê kengê hîmên vê al-fabê daniye ne diyar e. Ev alfabê ji 31 tîpan pek tê û ji milê rastê ber ve yê çepê tê nivîsandin. Li gor Sefizade Borekeyî, di danîna vê alfabê de ji alfabên Awestayî, Pehlewî û Erebî hatiye îstifade kirin. Kitêbên pîroz ên Ezidî-yan "Mishefa Re " û "Cilwe" û her wisa nivîsên olî yên Ezidiyan bi vê al-fabê hatine nivîsîn. Ev alfabe îro jî di nav Ezidiyan de tê bikaranîn. Ev alfa-be bi vî awayî ye.(13)

Bi alfaba Ezidiyan nivîsên bi Kurmanciyê gelek xwerû hene. Ji bo nimûne em dê nivîsek ji vê alfabê biwe înin. Gotinên ku di vê nivîsandinê de ne, yên îne ne û ji alê kurekî ve li ser mirina bavê xwe hatine gotin.(14)

Kurtedîroka alfabên ku kurdan bikaranîne ..Dûmahî..

bi tevayî her ku çûye welatên Ewrûpî di her warî de giraniya xwe zêdetir kirine; wisa bûye ku pirsên navnetewî, li ku derê dinyayê dibin bila bibin, bêyî hevkarî û mudaxala wan ne hatine çareser kirin. Her wisa welatên Ewrûpî pi tîgriya wan gelan ji dikirin, ku li dijî dewleta Osmanî er dikirin û dixwestin serxwebûna xwe bi dest bixin. Bayên ji Rojava, Kurd jî di nav de, li rew enbîrên li Stenbolê tesîrek gelek kûr dikirin. Gelek rew enbîrên Kurd jî zilm û zordariya Sultan Hemîd, ji welatê xwe bi dîr ketibûn, derketibûn derveyî welatê û li welatên Ewrûpa bûbûn muhacir. Ew gelek di bin tesîra rabûn û rûni tin, bîr, raman û terbiyên welatên rojava de diman. Her çend alfaba Erebbî tîrî dengên zimanê Kurdî ne kiribe jî, lê dîsa Kurdan ev alfaba bi sedan sal bikaranîbûn. Ji van sedemên li jor, di destpêka vê sedsalê de li gel bîr û ramanên pozîtîvizmê, alfaba Latîni jî, bala rew enbîrên Kurd ki andiye.

Yek ji van rew enbîrên ku bala xwe daye pîrsa alfabê, Dr Abdullah Cevdet e. Ew di kovara "Rojî Kurd" de (1913) dinivîsîne ku divê Kurd alfa-ba xwe biguherînin, ji ber ku alfaba Erebbî bersiva zimanê Kurdî nade. Dîsa di wan salan de, di nav endamên Komela Xwendekarên Kurdan-Hêvî (Kurd Talebeyî Hêvî Cemiyetî) de gotûbêjên dîr û dirêj li ser guhertina al-faba Kurdî çêdibin. Ji rew enbîrên wê demê Salih Bedirxan dibêje: "32 harfên ku di zimanê Osmanî de tên bikaranîn, ji bo zimanê Kurdî ne bes in. Ew (S.Bedirxan-C-ç, he t herfên nû li vê alfabê zêde dike û pê niyarî ronakbîrên Kurdan dike." Bi vê alfaba 40 tîpî di Rojî Kurd de çend nivîs derketine.(15) Li gor Kemal Badilli rew enbîrên Kurd ên ku li dora Rojî Kurd civiyabûn, li ser alfabeke ku nêzîkî ya Latîni bû dixebitîn. Lê mixabin erê Cîhanê yê yekemî ev xebat nivçe hi t.(16)

Lê bibe ne be pîrsek di serê mirov de çêdibe: Gelo rew enbîrên Kurd di wan salan de çiqas bala xwe dane ser alfabên kevn ên ku Kurdan bikaranî-bûn. Wek berê jî me got ji wan e alfabên ku berê hatibûn bikaranîn, heke em a Awestayî ne hesibînin (ku li ser vê alfabê dîtinên ku hev nagirin hene), du alfabên ku tenê Kurdan bikaranîbûn jî hebûn. Gelo rew enbîrên Kurd çiqas bala xwe dane ser pîrsa ku, ka ew tîpên di wan alfaban de hene çiqas kanin bersiva dengên zimanê Kurdî bidin? Dibe ku wan jî wek Dr. ivan li vê pîrsê nihêrtibin. Ew dibêje: "Her «çiqas ku, berî ola islamê Elfabeyek Kurdan ê taybetî hebû û îro jî, hin xwendayên Kurdên Ezdiyan dîsa bi vê elfabê ve dikarin binivîsin û bixwînin; lê belê êdî çî mane nîne ku li ser vê elfabeya arkaîkî, -ji aliyê giranî bihaya wê ya tarîxî pê ve,- em israr bikin."(17)

Wek tê zanîn hinek gel wek Cihû, Asûrî û Ermenî alfabên xwe yê herî kevn, her îro jî bikartînin û wan wek simbol û be eke ji bo hestê (hissê) netewî dibînin. Di dawîya erê Cîhanê yê Yekem de, Hêzên Dewleta Osmanî tîk çûn û Sultanê dewleta Osmanî bi welatên di er de bi serketî re, errawestandina Mondrosê îmza kir. Di vê dema qelsî û tevliheviya dewleta Osmanî de, Kurdan xwe dan hev û di dawîya sala 1918 an de, Komela Pê ketina Kurdistanê damezirandin (Kûrt Tealî Cemiyetî). Di çend hejmarên kovara "Jîn"ê de (1918-1919), kovara neresmî ya Komela Pê ketina Kurdistanê bû, li ser zehmetî û dijwariyên alfaba Erebbî ji bo zimanê Kurdî tê rawestandî. Nivîskarên Jînê gilî û gazinên xwe yê li ser vê pîrsê bi van çend gotinên manekûr tînin zimên: "Em çî bikin ku zimanekî Arî bi kirasê alfaba Samî bê nivîsîn, ancax ewqas mefadar dibe. Ibrê bigirin".(18)

Pa erê Cîhanê yê Yekem, ji ber sedemên ku alfaba Erebbî nikanibû bersiva dengên zimanê Kurdî bida, Major E.B. Soane ji bo zimanê Kurdî alfabeke Latîni çêkir û du kitêb jî bi vê alfabê nivîsîn. Ew kitêb ev in: "Elementary Kurmanjî Grammar", Bexdad, 1919, û "Kitabi Awwalaminî Qiraati Kurdi", Bexdad, 1920. Ev alfabe di nav Kurdan de zêde belav ne bû.(19)
3. CELADET BEDIRXAN Û ALFABA KURDÎ-LATINÎ3.1. Xebatên beriya Hawarê:
Di Gelawêja 1919 an de Peymana Sewrê hat imza

kirin, ku tê de hinek soz û qewl ji bo nivdewletek Kurd dihat dayîn. Li ser sînoren Ermenistan û Kurdistanê, daxwazên Kurd û Ermeniyên li dijî hev bûn. Ermeniyên be ekî mezinê Kurdistanê, di nav Ermenistanê de didan nî andan. Ji bo ronîkirina vê pîrsê heyetek li darxistin, da ku li Kurdistanê li nisbeta nifûsa Kurd û Ermeniyên bikole û bide diyarkirin. Serokê vê heyetê Ingilîz Ma-jor Noel bû û ji Kurdan jî, yê ku bi vê heyetê re bûn û alê M.Noel dikirin du bira bûn: Mîr Celadet û Mîr Kamûran Bedirxan. Ew ji Helebê bi rê dikevin tîr derdora Sirûcê, Entabê û ji wir jî, di meha Rezbera 1919 an de diçin Meletiyê. Ekrem Cemîl Pa a, hêj ew li Helebê ne, digihîjin wan.Wisa dixwiye ku gelek endamên Komela Pê ketina Kurdistanê li Meletiyê di gihîjin hev û dixwazin tevgera Kurdî tenzîm bikin.(20)Yek ji wan kesên ku tên Meletiyê, Evdîrehîm Rehmî yê Hekarî ye, ku wî dîsa Kurmancî dida Major Noel.

Sedema ku em vê bûyera dîrokî li vir dinivîsin ev e: Bi vê serlêdana welêt, dîtina çêkirina alfabeke Latîni ji bo zimanê Kurdî bi Mîr Celadet re çêdibe. Mîr Celadet li ser vê yekê weha dinivîsîne:

"Di sala 1919 an de, me dabû çiyayên Meletiyê. Em ketibûn nav e îra Re iwan. Mêcer Nowel (Ingiliz) digel me bû. Mêcer zarê nîvro dizanîbû, dixebitî ku hîni zarê bakur bibe, û ji xwe re her ti t dinvîsandin. Min jî hin Metelok, stran û çîrok berhev dikirin Carinan me li nivîsarên xwe çavên xwe digêrandin, dixwendin û diedilandin Min bala xwe dida Mêcer, bi bilêvkirineke biyanî lê bê dijarî destnivîsa xwe dixwend. Lê belê ez, heta ko min (û) ji (o) û (î) ji (ê) h.p. derdixistin diketim ber hezar dijarî. Ma çîman?.. Ji ber ko Mêcer bi har fên Latîni, lê min bi harfên Erebbî dinivîsandin. Ser vê yekê, di cih de min qerara xwe da û ji xwe re bi Herfên Latîni alfabeke lêk anî. Edin min bikariya destnivîsa xwe pa hezar salî bê dijarî weke xwe bixwînim, ji ber ko her deng cihê cihê li ser kaxezê dihatin sekinandin." (21)

Bi vê biryara Mîr Celadet re, îcar dijwariyên di warê alfaba Latîni de rû didin. Lewra alfaba Latîni bi 26 tîpên xwe nikane bersiva dengên ku di zimanê Kurdî de hene bide. Ji alê din ve, ev dibû cara yekem ku zimanekî Hindo-Ewropayî yê di nav grûba zimanên Iranî de, dî bi alfaba Latîni bihata nivîsandin. Ji ber van dijwariyan, her çend Mîr Celadet dibêje, pi tî wî bi alfaba Latîni dest pê kir û nivîsî, karê wî hêsantir bû, lê belê ku ti tî ku wî dixwest"...her deng ciliê li ser kaxezê dihat sekinandin"- hêj ne qabil bû. Loma jî, wî ji bo hinek dengên zimanê Kurdî tîpên, hevedudanî (diftong) yê Latîni bikaranîn, wek (ou, ch, ai,...), Em nizani di wê demê de alfaba Mîr Celadet ji çend tîpan pêk dihat. Lê pi tî demek kurt, wî xwe ji çarçova alfaba Latîni deranî û ji dîla diftongên Latîni, wî ji alfabên Greki û Rûsî hinek tîpên serbixwe girtin û bi vî awayî, alfabeke ku heta ji dest tî, her deng miqabilê tîpekê anî. Ev alfaba wî ji 36 tîpan li hev hatiye.

Ji van kar û xebatên wî yê di nav du sê salan de dixwiye ku wî pîrsa alfaba Kurdî pîrseke gelek girîng girtiye û ew her li ser vê pîrsê xebitiye. Di sala 1922 an de, Kemalistan fermana ku tina wî, ya bav û her du birayên wî derxistin. Li ser vê yekê ew û birayê xwe Kamûran ji Tirkîyê derketin çûn Almanayê. Li wir Mîr Celadet hukuk xwend û xebata xwe ya li ser alfabê domand. Ew li ser xebata wan salan weha dibêje:

"Di sala 1924 a de, li Elmanyayê min careke din çavê xwe li elfabeya xwe gerand, hûr lê mêzekerî û mideke xwe li ser xebitîm. Min bala xwe dida û didît ko ev sê texlît herf (latîni, yûnanî û rûsî-CÇ qenc li hev ne dihatin, herfên yûnanî û rûsî yekrengiya elfabeyê xirab dikirin. jû pê ve tê de du herf hebûn ko ji me re gerek bûn. ji lewra min elfabeya xwe ji nû ve senifand: Herfên zêde jê avêtin, hin herfên Latî-nî bilindek li wan barkirin û di ûna herfên yûnanî û rûsî de êxistin. Bi vî awayî elfabeke bi 34 herfan û yekreng hat pê."(22)

Mîr Celadet di sala 1925 an de ji Almanayê vegehiya. Ew berê çû

Misirê û bi dû re jî, çû Libnanê ba apê xwe Xelîl Ramî. Di sala 1927 an de, ew jî yek ji wan welatparêzên Kurd e, ku be dariya damezrandina Xwebûnê (Xoybûnê) dîkin. Xoybûn, ore a Kurdistana Bakur dide ber xwe. Lê pi tî tîkçûna.serihildana Agiriyê, diyar dibe ku Xoybûn nikane xwe bigihîne vê armanca xwe ya pîroz.

Bûyeren di navbera salên 1925 û 1930 î de, li ser dîtinên Mîr Celadet tesîrek gelek mezin çêdikin. Ji vê tarîxê û ûn ve M. Celadet hemî jiyana xwe dide çareser kirina pîrs û pîrsgirêkên zimanê Kurdî (zaravê Kurmancî).

Ew û zimanzanê bi nav û deng yê ba ûrê Kurdistanê; Tewfîq Wehbî, ji bo bi kêmasî du zaravayên Kurdî (Kurmancî û "Sorani"), li Sûriyê bi hev re li ser alfabeke Latîni ya mu terek dixebitîn. Mixabin ev xebat beriya ku fêkî û berhemekê bide di nivî de dimine û T. Wehbî vedigere Iraqê.

CAVKANÎ:

1. E. M. Diyakonov, Tarîxê Mad, r. 339, wergera Farisî, 1345, Tehran.
2. Yê ji Herodot neqil dike, Borekeyî Sefîzade Seddîq, Mêjûy Wejey Kurdî-I, r.18, 1991, Baneh, Kurdistan.
3. Borekeyî Sefîzade Seddîq, Mêjûy Wejey Kurdî-I, r.15-16, 18,1991, Ba-neh Kurdistan.
4. Borekeyî S.S., and, r. 22-23.
5. Campbell , C. L., Compendium of the World's Languages, Vol I, p. 2 26, 2993, London .
6. Borekeyî S.S., and, r. 17.
7. Soran Sineyî, Qewalla Konekani Hewraman Kontirtn Belgeyî Nûsra-wî Ziwanî Neteweyî Kurd ke ta êsta dozrawe-tewa, Sirwe, hej. 67, r. 41-45, 1991, Wirmîye.
8. Borekeyî S.S., and, r.19.
9. Borekeyî.. S.S., and, r.20.
10. Musa Anter, Ferhenga Khurdî-Tirkî/Kürtge-Türkge Sözlük, r.164, 1967, Istanbul .
11. êx Muhamed Merdûxî Kurdistani, Tarixa Kurd û Kurdistan, werge-ra Ebdilkerim Mihemed Seid, r. 302, 1991.
12. êx Muhamed Merdûxî Kurdistani, and, r.81.
13. Borekeyî Sefîzade Seddîq, and, r.20.
14. Borekeyî S. S., Nameyî Ferhengê Iran-Defterê dovom, r. 16 (222)
15. Malmîsanij & M. Lewendî, Li Kurdistana bakur û H Tirkîyê Rojname-geriya Kurdî 1908-1981, r.56, 1989, Uppsala .
16. Badilh Kemal, Türkge îzahh Kürtge Cramerî, s. 23, îkinci baski 1992, MED Yayinahk, Istanbul .
17. Dr. ivan -Adara 1971-, di pê gotina kitêba "Zmanê Kurd" de, r. 15, 1976, Kava Yaymlan, Istanbul .
18. Jîn 1918-1919, Cild I, r.6, ji Pê kê iya M. E. Bozarslan, 1985, We an-xana Deng, Uppsala .
19. Cemal Nebez, Zimanî Yekgirtûyî Kurdî, r. 79, III, 1976, Almanyaya
20. Ekrem Cemîl Pa a, Muhtasar Hayatim, s. 42-43, Beybûn Yaymlan, 2. baski, 1992.
21. Hawar, jimar 13, Pê gotinek, r. 1-2, ji pê gotina Mihemed Bekir ya di qapa nu ya Hawar 1-9 de, hatiye girtin, r. XXI, We an-xana Hawar, 1987, Stockholm .
22. Hawar, jimar 13, Pê gotinêk, r. 1-2.

** Ji kovara ZEND ((kovara Enistûtuya kurdî)), Havîn 1994, hejmar 2

SOHTINA PERWANÊKÊ



Lewend Dalîni

Bi germî, xatir ji hev xwestin! ew kete ser rîya xwendinê li welatên biyaniyê, û qîz jî vegehiya warê xwe...Katjîmêr di rîya ku bajarê wê bi kinayî bi paîtextê ve girêdide; gelekî giran di gerîya, û ji pencera Otobosê ve jîyan renga reng pêlên xwe di sewdanê wê de di xemilandin? û pêre jî, peyalek êrîn ji pi kek nûjen ji xwere dino t.Pênc salê dîn weke îro ye !? emê bi hev re rêwîngî bin, û emê bi mēhvandarî peyabin. Rojên ku wê bēn, salên ku wê li wan derbasbîbin, hemû ji wan re pîlan û program danîn! Çi ji aliyên hemû tēkilîyên xwe û wî ve, û çî ji aliyê andin û gihî tina namên wan ve jî? ên bê rawestan. Di mehê de çar; di salê de çil û he t; di pênc salan de.....?

Di namên xwe de, jêre rojên ku bi hev re bûrandibûn wê di bîra wîde bîne, û rojên newroz û ahîyan wê bi kurayî li ser wan binivîsînê. Li ser kertên Sersala; wê bîna xwe a ku jê hesdikir; wê bire îne!.....Carna di nav rûpelên namyên xwede, wê çend pelên guleke sor jêre bi îne! namên wê, wê timî dirêj bin, û biartîyêke jîyan hevparî, wê tēde hebê!.... Heskîm wê zêdetir û zêdetir bibê, biyanî li rexekî û durbû li rexê din wê îranîyêke kurtir û xwe tir wê damezrînê!

Her ku dema gihî tina postê nêzîk bibê, wê beryawê li ber dergeh û penceran rawestê....Bi nazdarî wê nama ji dest postevan bigrê!.. Zû bi zû devê nama venakê, tanî ku eva re a xwe bernedê û qar nebê, deng û lebat nemînê..... Li ber ronîya mûm û findan bi romansiyet, û dîsa bi nazdarî wê devê wan vekê û bixwîne.

Namê her pênc salan ji wan re wê cihekî taîbet di nêv rûpelên dilê xwede wê çêkê, û tevan ji ezber bikê! Ku bibêje nama bîst û pêncan? wê zanibe çî tēde xwendibû!?. Di evîneke wîlo ji dil, tu ti t wê zehmet û giran tînebê!.... Hemû ti t di derheqa jê heskirinê de, hesanî dibê!..... Dem wê zû bibûrê, û tehlîbûna wê; wê zû îrîn bibê.

Wefadarîya wê ji wir, wê bê sînora bê, xortên cîhanê tevde wê bi biratî li wan tema ebikê; nerînen; wê bi pîvan û hesab bin; eger binêre jî, dilê wê; wê kor bê!?.

Timî dost û xwedî wê rew a wî, jê nasbikin! Keçîkên malbatê wê bi xwezîya bi dilê wêbin, ev kanîya ku evîne jê vedixwê ew jî wê bixwazin jê vexun?. Di civatê Keçkanî de, wê çîroka wan taîbetîyêke bigrê!.....Roj bi roj wê giranbûhatir bibê, û wê bibin sîmbola wefadarîyê di nav keç û xortên wê teverê de.

Di ramanên xwede gihî te qudsiyeteke heskirinê, û riwê wî di çavên zarokan re dibîne, di dan û standinên xwey ramanî de nema ji ên wî dikare, cuda bikê! heta di razana xwe de û di xewnên eva de jî, nema ji bil giyanê wî; tu sawîra bibînê. Dest bi hejmartina rojan dikir..... Roj derbasbûn; Îna yekemî çû!?... Dest bi nama xwe kir... Name bi dîmahî kir, pel bi pel xwend! Carekê dî caran... Name girt... Çar name nivîsîn û girtin, mihek qedîya; nav li ser nama danî, lê bê edrê!?....

Meh çûn, name gelek bûn.... Hêvî hin bi hin kêmb dibûn, û qut bûn?. Can zirav bû lebt û tever kêmbûn; îne koça xwe li warê wê danî û ma li ser; berxwedan neman, awestîyan, û janê can hêdî hêdî kire tēkilî xwe, û rehên xwe berdan û kur çûn!?. Zerbûn û ziravî bi hev re, xwe li can badan û zemkirin; zirav dirêst; tenêbûn û bê dengîyek dixwest!? û a dil ikest û hêvîyê cebarê qutdibûn!.

Gotin û li ber gerandin tu mîfî nedidan; hetwan û dermana di canê wê de ters kar dikirin. Kêlî bi kêlî mûm di helîya û ronî kêmb dibû..... erê manê û nemanê despêdikir, û rew a xwe zû dida xuyanî kirin; di meydanê de zû ji deshîlanî ket û zû ikest!.. Lebta perwanê Li hawîr dor girandibû.....û agir bi dîmahîka mûmê de diçû; hetanî ku ew wînda dikir..... û ew bixwe jî di mir û ronî wînda bû!?..... Perwane jî di arê xwe de di kewîya û bê deng dibû.....

12ê Çîrya Pa î 2001
Siûdiya Erebestan

Dîroka zarê kurdî



Ar ek Baravî

Zardiyardeyêke jiyaniye û ji boy pêrabûneke çandî û konevanî alaveke bi kêre, bi hebûna mirov re çê dibe û ge dibe û pê dikeve, çiku bandora jînwar û gelên hawîrdor li mirov heye.. zar jî weke mirove..û ew rêçana pevghijîtinêye.. her weke ku kevn û nuhê miletan pev digihêjîne, nêzî 3000 zar di cihan de hene, li hindê tenê nêzî 800 zarê zindî hene, her weha jî pîrr zar ji zû de mirine..lê kevnorekî çandî bi nivîsên li ser kevalên qehfîkî hi tine ku roj bi roj tene dîtî, hin zarên jibîrbûyî jî hene militên wan qirr bûne û qeliyane.

Ji her zerekî zindî re dîrokeke dûrî dirêj heye, ev zarê kurdî ê fîroj ne tenê ji hemû êwezarên zarên mîdiye.. ew ji êwezarê (avista) bi xwe ye, em nikarin bêjin.. zarên ewan miletên ku li ser xaka kurdan(mîtan, manî, gotî...) holişîne û bi cî bûne ew bingehên zarê kurdîne, her miletêkî jî wan aristanîyek li xaka kurdan ava kiriye.. û tîkiliyêke rêzimanî û rênivîsî di nav wan û zarê kurdî de çê bûye..û di demekê de bûye zerekî serbixwe, gellê kurd navê (kurmançî)lê kiriye .. belê ên ji bilî kurd navê(zarê kurdî) lê kirine.

Ji hêla dîtî ve jî ..bandora gellên cînar û hevî (somer , akad...).. ji hêla çandî û konevanî û olî ve li zarê kurdî bûye.. ew jî tev di bin bandora zarê mîtanî de mane, ev zar buwe serdestê herêma bakur ji welatên mezobotamya(navbera herdû rûbaran), gellê mîtan di sedsala pêncemîn berya zayîne de li navbera rojhilatî rûbarê Hayis û ta bi rûbarê Araks li jora Diclê û ta bi rojavayî zagros.. serdest bû, Mihemed Emîn Zekî gotiye: mîtanîyan di derdorî sedsala anizdem de B.Z.. li(mûsil-terabulsê) desaleteke xurt ava kiribûn û di dema (a ûr nasirbal) de qeliyan..hino hino welatên wan stendin û ew ji hebûnê tune kirin.

Hîrodotsê dîrokas gotiye: (485-425 B.Z).. çar milet li rojhilatî Yonanistanê dijîyan(ermen, sazîr, ardo, mîtanî..) navê kurd ta wê demê jî nenas bû ji wan re.

Ji bêtîyên ku hevbe in di kurdî û horî(zarê mîtanî) de: firr(vartana), yek(ayka), sê(terra), pênc(penca), haft(satta), ta(arta), rastî(satya). Nêzî du hezar sal B.Z.. koçberên Hindistan û Oropa hatine li herêmên kurdanû çiyayên zagros bi cî bûne,bandora zarên wan li hev bûne..lewra hin guhertin ketiye zarê mîtanî û ew dem destpêka çêbûna zarê kurdî bû li gor dîrokasên ku dibêjin :zarê kurdî pêmayê rewayî ji mîtanîye..û amaje kirine ku kevalên ahên a ûr bi kurdî hatine nivîsîn.. û kurd ew xwediyê kevnorekî zar û dîrokê li wê herêmanê.

Kurd arîne û arî ji çiyêne ji berya dîrokê de, tevî miletan bûne û efsaneyî ava kirine, zarê kurdî jî ji malbata hindoropiye ..û koma ademîzadên Êranî ên arî jî ji wê malbatêne, Mihemed emîn Zekî gotiye:(kurd jimiletên(Hind-Êranî).. ew hatin kurdistan di dema ku mîdî hatin mîdiya û parsî hatin parsya.., û rêkefta hatina kurd pi tî(650 B.Z)çiku tomargehên a ûr ên berya vê demê ti tek di vî warî de bibîr nanîne..), rojhilatnas THAREAN DANGIN gotiye: ewî di kovara a ûrlogî de dîtîye..du kevalên kevnar bi nex ên ji dîroka du hezar sal berya zayîne de li sere, kuherêma (kar-dekar) li nik xelkên(soy) bûn ku li ba ûrî gola wanê dijîyan, her weha dibêje.. pi tî evê rêkeftê bi hezar salî (tîglat pilser 1098-1068 B.Z) erê miletêkî bi navê(kurd) li çiyayê(ezo) kiriye.. û bi wan re keştiye,Daryo ê rojhilatnas dibêje: ezo çiyayê(Hazoye) demekî (Sasûne).

Walas layn bi gumane ku zarê kurdî jî pîrr êwezarene(ji koma zarên Êranî ên ba ûrê rojavane, lê êwezare li gor cogarafiya herêman belavin,bi bakur de biber zapê mezin re ta bi gola Ormiya.. pîrrên kurdan bi kurmançî daxivin.. û bi ba ûrî wê rêzê de .. bi soraniya ku be eke ji kurmançî daxivin.. û hin ji kurdan bi zazakî û hin jî bi goranî daxivin),koma zarên Êranî be eke ji koma (hindo Êranî) û ev kom du be in:

1- zarên hindî: Birakranî,Miranî,Binçanî,Koçeranî,Racasanî,Buharî,Bingalî..û deqa kevnar ji evan zaran re navê ANJÊKIRÎTÎ(sensekrîfî) lê dibe, sirûdên olî ji olê birahma re pê hatine nivîsîn.. û deqa herî kevn(rêk vêda) bi wateya rêya zanîneye,ew pirtûka herî kevnar û pîroze .. sala 1200 B.Z hatiye nivîsîn ew li ba hindîyan weke Avista li ba gelên Êraniye.

2- zarên Êranî: Parsiya kevn û nuh, Kurdiya kevn û nuh,Efganî,Blocî..., zimanê kurdî kat daye û ge bûye û weke hemû zimanên zindî êwezare xwe bi xwe re hilaniye,ji zarên arî ên kevnar jî (ZEND û PEHLE) hene,gumana herî nêz ewe ku kurmacî nêztîrîn zare ji zarên arî ên kevnar re û nemaze zarê Zend-Avista,ew bûbû zarê olê Êranî û ji rojava (buxara) ta Azerbêcan .. demek li hemûwelatên Êranî bakur ji bilindahiya Êran û herêma rista çiyayên zagros û împaratorî jî çavkaniyên diclê û ferat ta bi kendava erebî..bû zarê axaftin û hevpeyvînê.

Lê Pehle .. li Îraqa parsî û mîdiya mezin û kolên pers pêk dihat weke zarê gi tiyên xelkê, zarê kurdî kevnar dihat nasîn bi zarê pehlwanan angoy lehengan, çiku bêtîyên(goto, kirdo) bi wateya cengawer û leheng tî, pîrrên lêkolîneran dibêjin kurdî ne ji persî hatiye çiku ew jê kevtîre,lewraSidnî Smêt û Jostî û Sosnî gotine: zarê kurdî serbixweye bi hevberdî û amajeyên xwe ve

û pê ketinên wênî dîrokî hene, bi rastî ew zerekî qence û di mûzîka xwe decudaye, Jostî jî tekez dike kuzarê kurdî zerekî resene û rêzimana vî zarî ji a parsî û turkî û erebî jî kokê de cudaye.

Dîrokas pîspor.. Mijor Admonse gotiye: zarê kurdî serbixweye..ûherdû zanyarên Elman(Rodcer,pot) jî gotine: zarê kurdî serbixweye û mançî kirine ku ne ji parsîye,lê belê lêkolîner û zimanzanê kurd Tewfîq Wehbî gotiye: Kurd û mad.. yek netewin.

Pirtûka Avista gotinê dibirre ku kurd û miletên Êran bi zerekî hevbe bûn, tevî ku zarê avista û zerade t (ê ku li textê silêman..li bakurê mîdiya..ji dayik bûye)nêzî êwezare Mukrî bû, hin jî dibêjin zerade t kurd bû ,mukrî bû ..ji êla Maz bû.. ji xelkên ormî- rizayê bû.. ji nav miletê xwe çû ûbû mizgînguhêzê miletê dîtîr,lewra Avista bû pêmayêke pîroz ji xelkên Êranê re bi tevayî.. û weke ferhengeke gi tîcî girt,zerde t xwe li Efganistanê kire pêxember jî û li Mezar erîfê li Efganistanê mir.

Medî an medî: Ibin xeldûn gotiye medî kurdin.

Hesen bîrnîyay di dîroka(Êran bastinda) de ..rûpelê 168..gotiye:

Mêdî Arîne .. û ew bavpîrên kurdane.

Merdox di verêjeke dîrokî de gotiye: Aramas sultanê mîdiyanî yekem bû û li ba girîkan bi Keyqobad nas dibû.

Domerkan gotiye: medî berya Îsa bi 2000 sal hebûn.

Hîrodots gotiye: damezrînerê qiralgêha Medan Diyakoye.

Dîrokasê girîk(gîtizyas) gotiye: deh sultanên dewleta mezdî bûn û ê dawî Astîgaz bû..350 salî serdestî kiriye.

Sazan berya zayîne bi 400 salî qeralgeh ava kirine û damezrîner Erdî êr bû,bavê wî babîkê kurd ji qata ivanan bû û dayika wî Bayik .. ji êla (bazrengî) a kurd bû,88 sal kir û 25 salan qeral maye û qeralê dawî ji sazan (yezdîkurd)bû.

29 qeralên sazan qeralî ji dest hev girtin û paytexta wan (Mada yan)bû.. di pê re navê wê kirin medain.

Kolonêl Dohose di sala 1869 de gotiye: serê mezin û zebekên xurt û porê re .. û ebrîwên qalind ..ên kurdan mîna ên sazanên kevnarin.

Teberî gotiye: Erdî êr kurê Babîkê Silmanê kurê Babîkê Zirariye .

Yaqûtê Hemwî gotiye: ti tî ku sazan di bîra me tîne ew bajarê wan(medaine) ku navê wî bajarî berê(Kurd awa) bû.

Teberî di be ê yekem rûpelê/478/ de .. deqa nameya ku Erdewanê persî ji Erdî êr re andiye..pi tî cenga diwem di navbera wan de..gotiye: (te nigê xwe zêde radaye û kujtina te hatiye..hey kurdê di konên kurda de xwedî bûye,kê rê daye te ku te ew tac li xwe kiriye û tu bûye qeralê wan welatên ku ah û xwediyên wan wendane..û kê biryara avakirina ewî bajarê ku te li biyabanê ava kiriye.. daye te?

Di warê nivîsîn û xwendinê bi zarê kurdî de..ji berya zayîne û ta nuha:

Azerbod pi tî bisilmanîyê dibêje: ez Azerbodim kurê Hemed serkanê Behdînanîm, bi pelan (yên kurd) hate nivîsandin.

Hîrodots gotiye:rista qeralênmedî,bersiva xwe li ber dadkirinê di rûpelan de dixwendin.

Kontizyasê girîk gotiye: bijîkêsera Erdî êr pirtûkek dîrokî li ser rojnamên serayê nivîsî bû.

Tewarata ku di dema Hexamenî ande hatibû nivîsîn, li ser yasa û hînkirina nivîsîn û xwendinê ..di qeralgeha mîdiyan de axiviye.

Avista û wêyên kurd herdû jî bi helbestî hatine nivîsandin û di sera sazan de bi dengê xwe û bilind dihatin xwendin,Babord helbest digot û Semtîr jî distiran.

Pirtûkên kurdî berya bisilmanîyê pîrr bûn,lê dema ku bisilmanan kurdistan nijde kirin..pîrrên name û rojname û nivîs avêtin çeman bi behana ku mecûsîne û zerde tîne, hin ji wan hatin derxistin û ew du be bûn:1- ên olî,olê medî,avista,zend, wêyên kurd.. û hinên dîtîr ên zerde tî.2- mijarên konevanî,zîhrî û nerêfî,tendurîstî,hînkirin, wêjeyî,dîrokî û efsane û çîrok, karûbarên rêvebirya dewletê,hin jî li ser yasayên e rengê û hunerên siwariyê û tîr û kevanan, pî esazî,çandinî û zevî û daistan,xaknasî,stêrnasî, pîtolî....

Ev jî navên hin pirtûkên berya zayîne:avista,wêyên kurd, bînduhesin, dadistan dênêyîk,artarî,wêravname,karnameyê erdî êr babekan, zirêran, dadistan rêdik,xosire û gotan, wi terengname, xutayname, xuwayname,ristemname...

Pîrên wan ji pehle wergeriyan persî û erebî..xutayname buwe Sêr elmilûk û xuwayname bi persî bû ahaname, pirtûka glêla û demenhi ji hindistanê derbasî kurdistanê bû di dema dadwer û serdestê kurd Erdî êr de û wergeriya pehle û persî.hemû pirtûk û nameyên ku di dema bisilmanîyê de bi persî derketin tev de di dema sazan de bi kurdî hatibûn nivîsîn, ji wn pirtûkan jî: wamiq û azra,yesnê û ramîtê, eskewname, yorasîp, bilhor, îrîn û ferhad, baramname kirjasibname, behmenname, ehreyarname, cihangêrname, feramerzname,birzûname, bextiyarname,hezarefsane,witistanî sindîbad.. û bi hezaran pirtûkên dîtîr...

Ar ek Baravî -Amûdê

Ez û
pênûsa
xwe



Narîn Omer

Çand û wêje neynikin

Dibêjin:

Çand û wêje neynika gel û civaka ne, û nivîskar û rew enbîr zimanê civak û mileta ne, ji ber ku rola wan mîna keskesorê ye, hemî rengên jiyane bi deng û reng dîkin, û pênasîna hemî tevliheviyên civakê e kere û îrove dîkin.

Rew enbîr û nivîskar bi tena xwe nikarin rengê jiyane zelal bikin, û wê nikaribin dengê civakê bi awayek seranser bigihînin gel û kesan, tu caran wê nikaribin wêneyên xak û ezman bi wateyên zelal li berçav bînin, lewra ji hemiyana tete xwestin ku ew mil bidin mil, dest bi dest, ji dil û can derbasî daristana çand û wêje û hunerê bibin, bi êweyek rast û yekser wêneyên neynikê vajî bikin, û wateyên jiyane bi hebûn û mayîne re îrove bikin, da hemî bi hev re dîrokek nû û serbixwe ji niv ên îro û yên pê erojê re biafirînin

JANKÎMAN OMER... DILSOJA HUNER Ê !..



Bêkes Têlo

Pir kêm kes dizan in ku Îsak Newton nûderhênanê têoriya rengan e, gava di sala 1666 de qetek qezêz danî ber tîrêja rokê, di ancamê de rengê, sor, kesk, zer û în derket holê. Bi wateyêke din, ronahî ku bê reng e, van rengan hildigre. Li gel veyî jî, tê diyar kirin, bê ronahî ti reng tune. Nîgarkê ê Amerîkî H.Hofman di bêje: (Di xwezayê de ronahî reng pêktîne, lê di hunera nigarkê iyê de reng ronahî derfîne).

Hin mirov hene nekarin ew poxê ku xwaza an jî, „yezdan,, daye me ba bixwîn. Ew pox ku tu xwaza, mirovan bibînî. Tu bi derdorê re hest bibî neku hema weke zizoka robarekî tenê xwarin daqurtîm.

Kî dilge nabe ji vekirina pencerekî di dil de û çavê giyanê xwe weke deku spehîbûnê di vê çerxa merezî de bibîne ?. Ev dema ku her diçe mirovîtiya xwe tede wenda dike .Ti ked ji kedên mirov nikare vê rêkîroxê (wezîfê) bi çî bîne ji bilî huner.

Huner dilê xweliya dilê mirovan e, vekirî ye bo mirovan, îro û sibe deku aramî ,hezkirin bide. Ji bo jiyana sipehîtir bike, Jiyana ku dagirtî ye ji azarkê î û belengazî ,huner teko îna xwe didomîne.

Ti huner bi peyasyekê tenê peyda nabe, em bêjin hunera êwakarî ji didwan e û ya endeziyar, peykarsazî ji sê payaseyan pêktê. Hunera mûzîk û helbestkarî ji çar payaseyan e, û her be ji van huneran hewl dide ku tevî atmosfêra yê din bibe weke hunera êwakarî û Grafîk ku ji du payaseyan pêktên.

Girafîk yek ji hunerên êwakarî ye ku bi hunera re û sipî hatiye naskirin.Ev huner bi jiyana e û bi rew a mirovan ve girêdayê,tê bikar anînin weke pergala pirtûkan,rêklamman,hunereke biserxwe ye bi rêveberî û rêkîroxa xwe de rêbaze.

Bandora Girafîkê di pê birga nabêra atmosfer û panbûna metiriyala tabloyê û valahiya sipî de ye. Girafîk hunera pêwendîya dîtwerî ye alavên girîn li ba wê hene weke form,valahî,rohnahtî ,hemojîna hemû perçên tabloyê bi hev re,rîtîma livbûna çav ji alavêkî bo yê dîtir, kûrahî, zûm, lê ya herî balkê destnî ana navendî ye a ku çavê dîtwer bi serxwe ve dik îne.

Li Rojavayê kurdistanê hunera êwakarî gihayê radeyêke navnetewî û navên pir balkê li holê berz bûne weke Bî ar Îsa, B. Haco, Zûher Hesîb, X.Kader û h.. d..mora hunera kurdî di hunera ehristanî û navnetewî de çî girtiye. Lê hunermenda kurdîstana Rojava Jankîman Grafîk û êwakarî bi hev re dixebitîne.



Cengîman Omer

Hunermend Jankîman Grafîkar, êwekar, pex anûs û zasvan e, lê Grafîk û ewakarî bi awayekî wê daqurtandin e .

Bi riya Tabloyên xwe, mereq û pîrsgirêgan bi hûrbîni pê kê dike û derdibîrin e.

Gava hunermend tabloyekê nîgar dike, du hêl an dûrbûn hene ji tabloyê re, lê Jankîman vê yasayê derbas dike. Ez ê mukir bêm ku ev zirteke jêre tê hesab kirin gava tema van ligel xwe û tabloyê ve bejdar dike. Ava re û rengên avîkî bi rengê xêzên zîzkak û tevlihevî lige

la ên tewyayî di tabloyên xwe de dixebitîne deku hest û raman û kêlikên jiyayî di kêlikê afrandinê derhêne.Vaya em li ba pir hunermendan em dibînin, lê li ba Jankîman ê seraser e, zindî û xûyay e.

Hin ji tabloyên wê bi hestdarî û bedewî diaxivin tu dibêjtî weke ku bi peyvyan diaxiv in. Talênta xwe ya resen ji afirandina azad bi mijarên neyeksan e, bi salan kedek hêja durtî çirûskên ragihandin û qelbalaxî hunera xwe didomîne .



Perwazekî dep çarqorzi û perdak sipî, deku hewara xwe bi rengan vêxîne. Dibe gerok di nav hest û fantaziya xwe de, di kêliya kar de helwesta xwe li hember jiyana bi mora xwe yî hestedar xûyanî dike.Weke her kurdek pê eng, çiyayek îni hildiger e,ji nalîngaz weke qe bûna sermayekê, bi bê dawî pêlên giyanê xwe ser rûyê tabloyekê werdike. Hinge dilsojiya rengan bi germahiya hest û raman xwe ve vejîneke nû dide wan, bi zimanê hunera xwe wan werdigerîn e .



Gava min tabloya „Sînema Amûdê,, ser dîwarê Jankîman di Fêysbûkê de min dît ,pênûsa min sincirî û min van hevokan nivîsand.

„ van figûrên zarokên me,di wê sibeha çav eliqî de dev vekirî mabûn. ûnda bûn kulmek pepûkî bi nale nal weke jofiyekî revyayî, bejnên wan ji hevket û werbûn bi ser qadê, çep û rast weke derkû ê digindirîn..... bermayînen bêdenziya bazdayî ji xwîna wan,bi fibûneke hewar dikirin û ava sor ji dev tif dikrin.Tabloyeke hestedare kezab û cegera mirov dadiliqîne , .

Tablo û figûrên wê taybetmendî e, xwedî mijarên cuda weke Azadî,kêlikên evîne,potrêten cuda ,rew a jinê,cangoriyên Sînema Amûdê,rûdanên ore a Sûrî weke tabloya Baba Omer û w.d. Pêwendiyêke Jankîman bi la re heye, ku xwedî cawaziyeke û dagirtîye bi wateyan ,mîrov mijûl dike ku ifrên wê ji hev veke .

La ê mirovan di tabloyan de bi rengêkî hostetî xwedî armanc bo mesaja xwe bighîne tema evan bikartîne.Carna jî hin la ên ku nîgar dike ,bêhna mirov dicikîne û caran dilge iyek dide me, ev jî vedgere kêlikê afrandinê. Di evên bêkesî li bendemayîne Jankîman dengê xwe pêdiye bi hewara rengan, balonên tîrsê û qedexa li Rojava ser tabloyan radixe.Ev çirûskêk riya xwe ber bi zinara navdaran bi ked û vîna xwe vekirye û bawerim kes nikare eqfê jêre hilnegêve.



25.4.2012
Nîqosya -Qibirs
Rojnemavan Bêkes Têlo

Ji folklorê kurdî

Zerka zêra



Hebû tinebû xêr û xwe î li canê min û we bû. Malbatek ji malbatên kurda keçek wan hebû jêre digotin Zerka Zêra, gelekî xwe ik bû û ew bixwe jîr û jêhatî bû, xwî ka heft bira bû.

Rojekê Zerka Zêra û keçikê hevalê wê çûne çolê pû bidine hev, dayka wê ekir û sewik jêre xistibûne torbekî ji bo li çolê bixwe. Keçik gihane çolê û dest bi danheva pû kirin, lê Zerka Zêra berî teva pi tiyê xwe girêda û rûni t û çêkir û sewikê xwe xwarin, di peyre gote keçika ezê li ber siha pi tiyê xwe razim dema we jî pi tiyê xwe girêda dey li min bikin ji bo em herin malê.

Keçikê hevalê wê pi tiyê xwe girêdan, lê ewan dey lê nekirin ji ber ew ji wan jêhatîtir bû û keçik tev dinava xwe de jê nexwe bûn ji ber vê sedemê.

Zerka Zêra ma di xewa êrîn de, lê hevalê wê çûne malê, li wê çola vala Zerka Zêra bi tena xwe maye.

Carekê ji xew iyar bû nerî vaye li çolê ye û eva re bi ser de hatiye, nema zanê çî bikê, li dora xwe meyzekir û bankir:wa yadêê... dengêkî lê vegeand û got: ti çî dixwazê ez im dayka te?!Zerka Zêra got ev ne dengê dayka min e, dengê dayka min zirav û dirêje. Pi ti demeke ne dirêj dîsa Zerka Zêra bankir û got: wa yaboo... careke di dengêkî lê vegeand û got ti çî dixwazê ezi m bavê te?!Lê Zerka Zêra dîse got ev ne dengê bavê min e, dengê bavê min qutî sitore. Ji ni kave hirçekî xwe diyar kir, Zerka Zêra ji hi ket, hirç rahi tiyê û ew bire cihê ku lê dijî. Demek derbas bû Zerka Zêra ji xew iyar bû lê çî bibîne?!!!

Çavê xwe firkandin û dinava xwe de got gelo ev xewne yan jî çî ye?. Lê pi ti demeke ne dirêj ew gihi te baweriyê ku ev ne xewne, hîn ew di nava ramanên xwe de bû hirç derbasî ikeftê bû û got ji îro pêve tu kebanîya min î û tê bibî dayka zarokê min.

Bav û birayê Zerka Zêra li ser wê dîn û har bûne û deverek nema ew lê negeryan lê bê çare. Çend sal derbas bûn du zarok ji zerka zêrare çêbûn, lê hirç devê ikeftê asê kiriyê û nahêlê Zerka Zêra û herdû zarok derkevin, ji wan re xwarîne tîne û êvara bi wan re dimîne.

Her sibe Zerka Zêra tê devê ikeftê û bi hêviya çarekê ku ji nav lepê hirç azad bibê.

Rojekê mîna heroj Zerka Zêra li devê ikeftê rûni tiye, dengê bilûra ivanekî ji dûrve hat, ewê got hebê nebê ev ivanê mala bavê min e, rabû ser xwe û bi dengêkî bilind bankir û got:

Wa ivano
ivanê mala bavê mino
Pez berda mêrga mezino
Ez Zerka Zêra me
Xwî ka heft bira me
Ev çend sale

Ez êsîr û Girtîka devê hirç û gura me

Bivî rengî bandikê û li devê deriyê ikeftê dimîne ta dibe êvar. Roja dî ji wisa dikê û ew hêvî û omîda xwe qut nakê.

Rojekê mîna heroj Zerka Zêra li ber devê deriyê ikeftê rûni tîbû, nêriyek hate ber devê deriyê ikeftê û ew geyayê ku li ber deriyê ikeftê îni hatibû dixwar, Zerka Zêra lê nerî û got :ev nêrî ji peze mala bavê mine, ez nî ana wê nas dikim, kêfa wê gelekî hat û baqek geya jêkir û da ber devê nêrî, nêrî jî xwe nêzikî wê kir, Zerka Zêra bi lez hingulîska xwe ji tiliya xwe kir û xiste qilochê nêrîde.

Bi roj êvarê ivan pez anî mal, dayka Zerka Zêra mîna her roj çû nav pez û dest bi do andina pez kir, carekê nerî ewqek ji qilochê nêriyê wa çû?, xwe nêzikî nêrî kir, nerî vaye hingulîskêk di qilochê wî deye, dema hingulîsk ji qilochê nêrî ki and matmayî ma û bankire bav û birayê Zerka Zêra û got: ev hingulîska keça min e, tevde li hevdu kom bûn û ji ivan pîrsîn: te îro pez li kuderê di çêrand?

ivan got mêrgeke mezin di binya çiyêre ti î geyaye û nefel û indeko ye.

Roja dî serê sibehê zû birayê Zerka Zêra bi ivan re çûne wê mêrgê û çavê wan ma li nêrî, pez li mêrgê belav bû û her çend mih û bex û bizin berê xwe dane alîkî û ji xwe re diçêrin. Carekê ewî nêrî berê xwe da qurçikekê ji mêrgê û bi çêrandîne di me î, her heft bira dane dûv nêrî, nêrî nêzikî ikeftê bû û hêdî hêdî xwe nêzikî devê ikeftê kir, birayê keçikê xwe ve artin di bara kendalekî de, û ji ni kave dengê Zerka Zêra ji dûr ve hat û got:

Wa ivano
ivanê mala bavê mino
Pez berda mêrga mezino
Ez Zerka Zêra me
Xwî ka heft bira me
Ev çend sale

Ez êsîr û Girtîka devê hirç û gura me

Birayê wê dengê wê naskirin û ber bi devê ikeftê ve çûn û bankirin wa Zerka Zêra em birayê tene û em hatine te azad bikin, dema Zerka Zêra dengê birayê xwe kir kêfa wê gelekî hat û ji wan re got devê ikeftê gelekî asêye û divê win leza xwe bikin berî hirç werê lê wê gewdê we parçe parçe bikê.

Her heft bira xwî ka xwe ji ikeftê derxistin û birayê mezin xwest herdu zaroka bikujê lê xwî ka wî destê xwe hilda û got: na bira na, erê ew ji pi ta hirçine lê dawî ew ji kezaba min in .Zerka Zêra û her heft birayê xwe çûne mal û zarok di hindir wê ikeftêde hi tin.

Êvarî hirç hate mal, nerî vaye devê deriyê ikeftê vekiriyê, derbasî hindirê ikeftê bû Zerka Zêra nedît, ji zarokê xwe pîrsî: kanî dayka we? Zarokê got xalê me hatin ew birin.

Dema hirç wisa bihîst, çavê wî sor bûn hêrsa ew girtin û miwê wî rabûn, destê xwe avête yekî ji zaroka û ew li bin guhê ikeftê xist ew ku t, kurikê dî xwest bazdê lê ew jî girt û li bin guhê ikeftê xist û ew jî ku t.

Hirç bi serê çiya ket û nema zanê çî bike, ramanên wî kûr û dûr diçûn, dawî giha biryarekê, di nava xwe de got ezê çawa wê nasbikim dema ez lê bigerim, vegea ikeftê û tûrek zêr bi xwe re bir û çû cihê ku mala Zerka Zêra li wir û dinava sikakan de me î û ban dikir: werin werin ken bizêr, ken bizêr.

Mebesta wî jê ew bû ku çî keçika bibîne diranê wê bibîne ji ber diranekî Zerka Zêra zêrkirî hebû û bivî rengî dibe ku karibê wê bibîne û wê birevîne. Lê bê çare çend rojan bi vî rengî di geriya bê ku ti tekî biserxê .

Hirç nema çare dît ji bilî ku êrî ê berdê ser malên gund tevdekî.

Rojekê rahi te destare xwe(dibêjin destarekî hirç hebû pir giran bû),berê xwe da gundê Zerka Zêra û bankir ez hirçê de t û çiya me, ez mêrê Zerka Zêrame, ez hatime yan ku ti yan jî hi ti, birayê Zerka Zêra derketin û bi wan re tîr û kevan û rim. Hirç ji ewata nava xwe destar tavête wan lê ji hêza gelek diser serê wan re derbas dibû, carna destare wî di ser malan teva re derbas dibû, er dinavbera hirç û birayê Zerka Zêra de berdewam kir ta her heft bira bi hev re li ber hirç sekinîn û bi tîr û kevanên xwe ew ku tin û kesên wê herêmê ji zilm û tîrsa hirç xelas kirin.

Çiroka me bigihê hezaran,xêr û xwe î bibarê li dê û bavê guhdaran.


*{ ev çiroke folklorîye û min ji devê gelek pîrekan girtiye, û ev çirok bi gelek rengan hatiye gotin, dibe ku kêmasî hebe, ez lêborîna xwe dixwazim}."Dilovan Çeto".

Têbînî: me xwest em çirokê bi orgînalê wê ya devokî bihêlin, daku rihê wê yê folklorî ku Dilovan Çeto pê nivîsandiye biparêzin."Pênûsa Nû".

Pirtûka çîrokên pêkenokî û îronîk



Lokman Polat



Lokman Polat

Pirtûka nivîskarê kurd ê binxetê (ba urê biçûk ê rojavayê Kurdistanê.) Qado Şêrin a bi navê "Serok û Merok" di nav we anên "Sema" de derketiye. Pirtûk 118 rûpel e. Berga pirtûkê hunermendê qarîkatorîst Dîno çekiriye. Bergeke gelek balkê e. Serokekî li pi ta zilamê xwe siwar bûye û dibêje "de bime e hevalo bime e, rizgarkirina welat hîn dûre..." we anên "Sema" li dewleta mîrekî areb a bi navê "Ebu Dabî - Dubey" de ye û li wir pirtûkên kurdî (kurmançî û soranî) û arebî diwe îne. Di dawiya pirtûkê de listeya navên pirtûkên ku we anên Sema bi arebî û kurdî derxistiye, heye.

Di vê pirtûka çîrokên pêkenokî û îronîk de 22 kurteçîrok hene. Navên van kurteçîrokan jî gelek balkê in û kena mirov tînin. Ji xwe ji bo ku hêla mîzahî - pêkenokî - a naveroka pirtûkê wisa xurte ku, mirov hêj di serî de bi sernavê çîrokê dikene. Ji xwe re wek mînak li van çend sernavan binêrin. Serok û merok, Serokkirîn, Spî bûne serok, Serokê ji heriyê, Partiya malbatê, Partiya Don Kî otan, Ji xemgînî partiyek damezirand, Ax ji derdê mîrekî, Li min e ûkê, Ji te re adete ji min re xebhete, ma homo jî mîr in!

Mîzah çekekî gelek xurte û bi eweya edebî tê ravekirin. Li welatên pa vemaî, li dewletên dîktatorî û li hemberên bûyerên antî-demokratîk bi eweyeke pêkenokî rexne tene girtin û bi riya pêkenokê mixalefeta tete kirin. Sazûmanên antî-demokratîk û dîktator herî pir ji mîzahê -pêkenokê - ditirsin. Li tirkîyê mixalefeta herî xurt ku li dijê partiya desthilatdar tê kirin neku mixalefetiya partiya mixalefete ye, mixalefetiya kovarên mîzahî -pêkenokî - ye ku tim serê serokwezîrê komara Tirkîyê bi wan re dikeve te xelê û wan dide mahkemê. Kovareke mîzahî a bi tirkî navê wê "Uykusuz - bêxew" e û bi rastî jî xewa desthilatdaran dide revandin, ew ji ber mixalefetiya wê ranazin. Kovareke din a mîzahî jî navî "Girgir" e û ew jî henekên xwe bi desthilatdaran dike.

Ji bo mîzahê bi tirkî tenê peyva "mîzah" bikar tînin. Bi kurdî/kurmançî ji bo peyva mîzahê, peyva ken, henek, qerfe, tinaz, qomedî û pêkenî bikar tînin.

Çi heyf ku hêj jî li bakurê Kurdistanê kovareke mîzahî tune. Berê li Swêdê kovara mîzahî "Mîrkût" û "Zengil" derdiketin û li Stenbolê jî "Tewlo" derdiket, lê niha hersê kovar jî dernakevin. Evan kovaran bi hawayekî periyodîk newe iyan, herkê çend hejmar derketin û pa ê hatin girtin. Di edebiyata kurdî a nivîskî de jî be a mîzahê -pêkenokê - qels e. Pirtûkên mîzahî jî kêm in. Nivîskarên kurd yên ku pirtûkên mîzahî nivîsîne ji deh tiliyên destan naburin.

Di vê gotarê de nemimkûne ku ez behsa naveroka bîstûdu çîrokan bikim. Ez ê bi kurta hî bal bik înim ser naveroka hinek kurteçîrokan ku xwendevan întrese bikin û çîrokan bi tevahî bixwînin.

Nivîskarê pirtûka bi navê "Serok û Merok" Qado Şêrin hinek çîrokên xwe, dema li welêt bûye, li navça Qami lo û hinekan jî li Ewropayê - li Holanda - nivîsiye.

Pirtûk li kurteçîroka sernavê "Çavdan" dest pê dike. Di vê kurteçîrokê de behsa nivîskara temen biçûk Dil a û hevala wê behiya dike. Di çîroka "Mêrê bizina spî" de serboriya Kerîmo ê lêkolîvan ku dibêje "hîn deriyê girtî di dîroka me de hene" tê ravekirin. Mesela navlêkirina mêrê bizina spî jî, ji bo ku wî li ser bizinê dîtine û lewre jî vî navî lê danîne. Di çîroka "Serok kirîn" de behsa kongra partiyek tê kirin. Kongre sê ev û sê roj berdewam dike. Ew li ser mijara serokatîyê û hîlbijartina serokê partiyê mineqe e dikin. Di encama mînaqe eyan de dixwazin ku serokekî hîlbijêrin ku millet hemû li dor xwe bide hev. Nûnerêkî jî gogê - footballê - mînak dide û pê niyaz dike ku ew wek komên gogê çawa ku listikvanên ba dikirin an jî kirê dikin, ew jî dikarin serokekî ba ji partiya xwe re bikirin yan jî kirê kin. Kongre pê niyaza nûner dipejirîne û pa ê gelek ti t dibin, ez behsa wan nakim. Bila xwendevan pirtûkê bi tevahî bixwînin ku bizanibin pa ê çi dibe? Çi diqewime? Serok kirê dikin, nakin? Ev çîroka mîzahî -pêkenokî - xelata yekemîn a kovara "Zêvî" wergirtiye.

Di çîroka "Ax ku perê min hebana" de vebêj diyar dike ku perê wî hebana de wî çi bikira, tê ravekirin. Dema mirov vê çîrokê dixwîne, di he ê mirov de jî diçe ku heger pereyê mirov hebe, de mirov çi bike? Çi bikire? Zilamê kurd ku perê wî hebe çi dike? Bi min di serî de doxînsîstî dike, li pey keç û jinan digere. Ji xwe gotinek heye, dibêje "dema yekî kurd dewlemend bibe, yan dizewice yan jî mîrê dikuje." vebêjê çîrokê dibêje heger perê min hebe, min ê jinek ji xwe re anîba ku temenê wê çardeh salî ba, xwe ik ta ku tu bêjî xwe ik ba." Dema min vê çîrokê xwend ez jî ji xwe re fikirîm. Heger perê min hebe, ez gelek dewlemend bin, ez ê mîr nekujim lê jineka ciwan bînim. Ez ê li Amedê kultursentereke gelek mezî çêbikim ku tede menzelên cure yên çandî hebin, cihê tema ekirina film û leyistina anoyê hebe. Ez ê matbaayê bikirim û pê pirtûkên nivîskarên kurd çap bikim û ji firotina pirtûkan heqê keda nivîskaran bidim. Ez ê kovareke çandî, edebî, kovareke pîrs û pîrsgirêkên dîrokî, kovareke lêkolînî û kovareke xerû li ser zimên biwe înim. Ez ê rojnameyê nûjeyî û yeka magazînî xerû bi kurdî biwe înim. Û herweha ez ê kaneleke televizyonê xerû bi kurdî vekim û bi eweyeke azad, bi naverokeke pirdengî û pîrrengî biwe înim. Lêbelê heyfûsedmixabin ku perê min tune û ez heqê çapa pirtûkên xwe jî ji keda xwe û ji qirika zarokên xwe dibrim û didime çaxanê.

Em vegeerî naveroka çîrokên din û ez bi kurta hî behsa wan jî bikim. Nivîskarê kurd Qado Şêrin bi devê vebêj di çîroka "Boxê birîva" de henekê xwe li civînên bêvate yên partî û rêxistinên siyasî dike. Di jiyana xwe ya siyasî de ez jî bejdarê gelek civînên bêvate yên siyasî bum û me tu emcameke ba ji wan civînan negirt. Her civîn dibû haceta rexne li hevûdu girtin, dilê hevûdu ikandin û ji hevûdu xeyidandinê.

Çîroka "Kortik" çîrokeke mîzahî ya malbatî ye. Behsa zilamekî û jina wî ya bêerez, erûd ango qereçî dike. Zilam ji destê jinê hatiye elemanê. "Kortik" navê xwarineke. Jina zilam jê re herroj xwarina kortik dipijîne. Zilam bi eweyeke henekî nasnavê jina xwe kortik datîne û pê tinazê xwe dike. Di vê çîrokê de derdê jinek û di çîroka "Ax ji derdê mîrekî" de jî derdê lêgerîna mîrekî bi eweyeke pêkenokî tê ravekirin. Keçika ku di mal de maye (kesekî wê nebiriye, pê re nezewiciye) li mîrekî digere ku pê re bizewice.

Çîroka bi sernavê "Partiya don kî otan" ji xwe nav li ser e, behsa don kî otên ore ger û welatparêz dike. Ev partiya don kî otên ore ger û welatperwer ji kesên dîn yên ku ore gerin û welatparêzin pêk hatiye. Cihê pesnê ye ku kurdên dîn jî kurdperwerin, ore gerin. Vebêj bi devê berpirsiyarekî partiyê felsefeya partiyê weha pê kê dike. Weha dibêje: "Me felsefeyek ji bo xwe afirandiye, ji bo kurdîtiya xwe, li gor ahenga kesê kurd, em ne rojhilatî ne ne rojavayî ne, ne jî hevalê rebê jorî ne!!!" felsefeya dînan ji ya bîaqilan ba tir û xwe tir e.

Di çîroka "Pirtûkfiro" de behsa pirtûkfiro Silîvo tê kirin. Naveroka çîroka "li min sesûkê" li ser mijareke civakî ye û pir balkê e. Fîgurê çîrokê Welîd ê est û e salî, ji bo ku bizewice wênaya xwe ya xortaniyê ji keçeke ciwan re di îne. Çîroka ku navê xwe daye pirtûkê, ango çîroka bi navê "Serok û Merok" ravekirina mijareke siyasî û rêxistinî ye. Endamekî partiyê behsa serokê partiya xwe dike. Ev endam û endamên din yên partiyê serokê partiyê dikine wek pêxemberekî û datînine ser serê xwe. Di çîrokê de bi gelemperî rew a serokên partiyên bi eweyeke mîzahî tê ravekirin. Serlehangê çîrokê ku navê wî Soro ye, ji serokê partiya xwe re nameyêke balkê dinivîse û pê kê ê wî dike. Pi tî ku bersîva serokê partiyê tê, di nameya bersîvdanê de du ti t henin. Ev herdu ti t çine ku serokê partiyê ji endamê xwe re iyandiye?

Belê, du ti tên gelek balkê û girîng in. Ev herdu ti t bi gelemperî halê ruhiyeta gelek kesên ku xwedêgiravî serok û sekreterên partiyên dide nî andan û helwesta wan a li hemberê endamên ku weke Soro rexnegirin dide diyarkirin.

Di pirtûkê de gelek peyvên arebî û a iyên rêzimanî hene. Navê "Kurdistan" jî bi tîpa "k" ya biçûk hatiye nivîsîn. Divê bi "K" ya mezî be. Tîpa - herfa - serî a navên xweser, navên welatan û dewletan hertim bi herfa - tîpa - mezî tê nivîsîn. Wek mînak; Kurdistan, Amerîka, Îran. Ji bo tîpa serê navê neteweyan hinek kes biçûk û hinek kes mezî dinivîsin. Edîtorê we anên "Sema"yê Xanim Zeyneb Ya e. Kurdîya wê ba e. Ew edîtorê jîr û zana ye. Wê çawa û çima pirtûkê sererast nekiriye û a iyan rast nekiriye?

Mîn behsa naveroka hinek çîrokan kir û behsa gelekane nekir. Pirtûk jî hêla mîzahî ve serketiye. Mijarên çîrokan ba û xwe in, mirov didine kenîne. Bi hêviya ku nivîskar Qado Şêrin di hêla mîzahî de berhemdariya xwe bidomîne û berhemên nû biafirîne. Xwendevanên kurd li benda pirtûkek wî a nû ne.

Weke ku min di destpêka vê gotarê de jî got; di jiyana civakan de mîzah rolekî girîng dileyizîn. Di civakên ku di bin êrtên demokrasiyê de najîn û ji azadiya fikrî, ramanî bêpar in, mîzah rola herî mezî dileyize. Mîzah hem mirovan dide kenîne û hem jî mirovan dide fikrandîne. Bi eweya mîzahî li dij sazûmanê mixalefetiyeke ba tê kirin.

Mîzah li ser civakê tesîr dike, bandor datîne. Tesîra - bandora - mîzahê di dema ku xelk - gel - pîrs û pîrsgirêkên cwe nikare biaxife, wexta ku di bin qedexekirinê de ye, dema ku ronakbîr nikarin bi hêsanî dîtî û ramanên xwe bînin ziman, wê demê mîzah fonksiyonek girîng tîne çîh. Ew dem mîzah dibe zimanê gel û rew enbîrên mixalîf. Mîzah di ikandin û ji holê rakirina gelek tabuyên di nav gel de jî rolek dileyize. Bi riya mîzahê gelek ti t ji gel re tê ravekirin. Mîzah - pêkenok tiliya xwe di her qulikî de dike. Di nav çand û wêjeya kurdî de cihê mîzahî girîng e û herweha mîzah perçeyek ji têko îna doza netewa kurd e.

Axxx... War



Abbas-Abbas

Seydê Qertmîni, ji gundê Nisran, li binxetê, xwe tev her kar û axeftinê dikir, pêre jî diket nav pesin û xwe iya gundê xwe de, gundê ku ji dema fermanên re ve, li serxetê bi malbata xwe re jê koçber bibû:

-Qertmîn...Axxx...Û ax Qertmîn!...

Bivirê êzing birinê, ji destê xortan digirt, bi her dû destan bibanî dixist û bi himeta xwe ditanî xwar!...Heger qurm li ber bivirê wî parçe bûba, hingî serê xwe bi anazî hildida û digot:

-Bavoo...Ev çi ye!...De welahî li Qertmîne bivirê min nedibû du car!...

Û heger bivirê wî vale diçû, hingî bi axînek germ re, pi ta xwe rast dikir û bi tengezarî digot:

-Axxx...Ava Qertmîne!...Ava binxetê, xwîn li me weravt!...

Di çaxên werzan de, ku petîx dipe kivîn, petîxekî destarîkî bi destekî digirt û li dora xwe di zîvirî û bi dengekî bilind di got:

-De êdî Welahî, yên Qertmîne du caran ji vî petîxî girtir dibûn!...

Di ser kaniya avê re, ya ku di ber çemê Nisran de, ku bi destên ivanên gund hatibû vedan, di sekinî û bi keser digot:

-De bi navê Xwedêkim, liba tîrî dinav ava kaniyên Qertmîne de di eqitî!...Ava zelal...Zelal û cemidî, wek ava Zimzim!...

Sal derbas bûn û Seyêd hîn ji vî pesnî û ji vî cûde bûnê nehatiye xwar, heya wê sala ku mirovek ji gundê Nisran, ku ew jî cîranê Seyêd bû, bi barê qaçaxê re gihist gundê Qertmîne û pi tî çend rojan li Seyêd vegeyîra û li ber wî û gotina Qertmîne ma guhdar!...

Li ber siha camiya gund, di nav koma gundiyan de, wek tora xwe car dî Seyêd xwe kuxand û dest bi axeftinê kir û di nav re ket pesnê warê xwe!...

-De Welahî li Qer..

Cîranê wî axeftina wî bi ken birî û got:

-Xalê Seyêd, min Qertmîn dît!...

Çavên Xalê Seyêd, pêre pêre bi vî gotinê re ronî dan û bilez pîrsî:

-Êêê...Kaniya li rexê rojhilat...Dara Tu.. ya dinivê gund de...Xaniyê me...?

-Kroo Xaloo...Kaniya çi ...Dara çi û xaniyê çi...De Welahî gundekî ziwa û sor, xaniyên

kevîrî bi ser hev de hêrivî û kambax!...Gundekî gijilî!...De bi Xwedêkim, dema ti diketî nav pesnê gundê Qertmîne de, min digot anihî qoziyek ji bihi tê ye!...

Çavên Seyêd, ji çend ronakên hûr îlbûn û li xort nehêrt û bi keser berisva wî da:

-De lawê min, were ji vî dilî re bibêj!...De welahî li ber dilê min Qertmîn bihi t bû!... Û wê di vî dilî de bimîne bihi t!...

EWÊ

Fûad TEMO (YEKEM ÇIROKA MODERN A KURDÎ)

ewê kurê ivanekî ye. Ew bi xwe deh salî ye. Zarok e, lêbelê pir çavvekirî ye.

ewê diya xwe nedîye. Bavê wî jî reben û belengaz e. Qet ti tekî wan tune.

Tenê meteke ewê hebû, ew jî pîrek bû. ewê carna bi alî wê de diçe, dilê meta xwe hinekî digire.

ewê nola Sako li gundî te qeletî nedikir. Bo kesê dî ti tek nedigot. Tim xwe bi xwe bû. Gel hevalên xwe ba diçû, ji wan re gotinên dilmayî nedigot. Heta êvarê di nav gund de bê deng digeriya, dilîst, roja xwe derbaz dikir.

Ev çikûna ewê pir bi xwe îya gundiyan diçû. Hemû ewê î hez dikirin. Rîsipîyên gund herro ew dibirin mala xwe, xwarina wî didanê. Li wî xweyîfî dikirin. Her kes da ev zarok qenc e, jîr e, digot.

ewê herro êvarî, diçû ser riya bavê xwe, li hîvîya wî dima. Wekî bavê wî dihat, dibezîya pê îyê, xwe diavêt ser kulukê bavê xwe. Destê wî digirt, maç dikir. Bavê wî jî her du çavên kurê xwe maç dikir, dil hînik dibû.

Rojekê ewê dîsa diçe ser rê, li hîvîya bavê xwe bû. Gavek buhurî, roj çû ava, tarî ket hemû alî, bavê wî hêj nehatibû.

ewê nava wê tarîyê da tenê ma. Dilê wî lez dike, carna guhdarî dikir, ji tu derê da deng nedihat.

ewê li ciyekî rûni t, bona bavê xwe girîya, pa ê bi xwe ve çûbû.

Bavê ewê hêdî hêdî ji alî newalê da dihat, dengê pezan de tê girtibû.

ewê î deng bihîst, rabû gazî bavê xwe kir:

-Bavo! Bavo!

Bavê wî jî:

- O ewê , lawo tu yî li wê derê yî?

ewê :

-Herê bavo ez im.

Bav:

-Were bal min mergê m' gorî.

ewê bezîya bal bavê xwe, çû destê wî girt maç kir, pa ê got:

-Bavo tu îro bo çi wisan dereng mayî ? Bona çi zû nehatî ?

Bavê got:

-Ez gorî, kurê min pezan (pez) têr nexwaribû û ez jî piçek westî bûm lema derengî mam.

ewê go:

-Bavo, ez gorî, tu êdî wisan derengî nemîne. Tu zanî ku li malê kes tune. Ez li bal kê bimînîm? Girî...

-Bavê girîna kurê xwe dî, birîndariya dilê wî nû bû. Av ji çavê wî jî vala bû.

ivanê kal bi xwe ve hat, serê ewê girt nav destê xwe, çavê wî paqij kir, ramûsa pa ê got:

-Kurê min Xwedê mezin e, mirazê me jî dide...

Pa ê destê kurê xwe girt, hêdî hêdî hatin gundî.

ivanî pêz kir hew ê, pa î li gel kurê xwe rabû çûn. Li mala wan lihêf, balgî ti tekî wisan tunebû, tenê mitêlekî hebû. Bav û kur ketin paxila hev, bav milê xwe da bin serê ewê î jê re kir balgî. ewê jî serê xwe danî ser sînga bavê xwe, milê xwe jî avêt ustuyê bavê xwe.

Histêrê subê derketibû. Nêzîkî subê bû, dîka bang dida. Ba bi nermî û hêdî hêdî li serê daran dixist.

Pelan bi hejîna xwe re dengê xwe derdixistin.

Ji hemû alîyan da deng dihat. Hemû gundî rabûbûn, lê belê kur û bav hêj razabûn.

Gavek çû, ivan îyar bû. Gava pez rakirinê bû, ro buhurîbû. Belê ivanê kal nexwe bû. Di nav ciyê xwe de dinalîya. Carna li ruyê kurê xwe mêzedikir.

Di wê gavê da rîsipîyê gundî deriyê ivan lêda, pa î gazî kir:

- ivano, ivano!

ivan ji hundur da go:

-Ho lebê!

ivan çiqas dixwest ku rabbit derî vekit, belê nexwe îya wî nedihî t. Dengê derî ewê î hi yar kiribû.

Rabû derî vekir. Rîsipî hat hundur, ji ivanî ra got:

- ivano, tu îro bo çi wisan dereng mayî? Nîvro bûye, pez hê jî di nava hew ê da maye, birçî û bê xwê ye. Gundî galegala dîkin.

ivan jî got:

-Rîsipî ez çi bêjim, tu min dibînî. Ez îro pir nexwe im. Nexwe îya min giran e, lema dema pez rakirinê ez nehatim. Tu îro li ciyê min mirovekî bi îne, ka Xwedê çawa çê dike, çi derî ruwê min vedike.

ivan vê gotinê got, pa ê nav ciyê xwe da ket, nalîna wî rabû. ewê nalîna bavê xwe dî, dil tarî bû, bi ser babê xwe da ket û girîya. Dengê girîna law dilê rîsipî ewitand. Li wî mêze kir, bi xwe nekarîbû, xwe negirt û kemîde(?), ava çavê wî jî vala bû.

Pa ê bi xwe bi xwe hat û ji ivan re got:

- ivano, dilê xwe teng meke. Xwedê mezin e. Nexwe îya te ne giran e. Du sê rojan de derbas dibe. Ezê herim yekî bi înim ber pez, tu îro ji xwe ra rakeve, ta ku tu zinde be. Zikê we jî nuha birçî ye. ewê bila li gel min bê, ka em binêrin li malê çi pahtine, bila li gel xwe hin ti t bînit da ku hun bixwin. Ezê jî êvarî bêm.

Bavê wî ewê î and, li gel rîsipî çûn. ewê î bi rê da nexweşiya bavê xwe ji rîsipî pirsî. Rîsipî jî destê xwe avêt ustuyê ewê î û got:

-Kurê min, kovan meke, dil vekirî be. Ti tekî bavê te tune, du sê rojan de ew ê rabe ser xwe.

Ev gotina rîsipî dilê ewê î piçekî hînik kir. Pi tî gavekê hatin mala rîsipî. Çûn hundur, rûni tin. Rîsipî gazî xulamê xwe kir û jê ra got:

-Rizqo, kurê min, ivan nexwe e, îro tu here ber pez, pez di hew ê da qir bû.

Rizqo jî bi gotina mezinê xwe kir. Darek girt destê xwe û çû...

Rîsipî li gel ewê î zikê xwe têr kirin. Pa ê emaneke tijî kir xwarin û da destê ewê î û got:

-Kurê min dil teng mebe, evê xwarinê jî hêdî hêdî bibe bo bavê xwe, nuha li hêvîya te ye. Bal bavê xwe rûne, bi gotina wî bike, çi dixwaze çêke, dilê wî me kîne. Ez jî pa î têm.

dawî

Ev çîrok ji kovara Rojî Kurd, no:1 (Hezîran 1329=1913) r:25-26 û no:2 (Temmuz 1329=1913) r: 24-25 hatîye girtin ku bi herfên erebî ya alfaba osmanî hatîye nivîsîn. Min jî ji herfên erebî wergerand ser alfabe ya latînî ya kurdî. Di wergera wê de min zimanê wê jî hinekî rast kir. Çewtîyên ku min rast kirine hinek ji wan çewtîyên çapê ne, lê hinek jî çewtîyên awakirina awayên cumleyên kurdî bûn, ku min rast kirin.


Wekî ji dawîya çîrokê jî tê famkirin ku çîrok hê jî xelas nebûye. Her çendî di hejmar

2. a kovara Rojî Kurd de dinivîse "dawî heye", lê mixabin dawîya çîrokê ne di hejmar 3. û ne jî di hejmar 4. a kovarê de heye. Her weha navê çîrokê jî nehatîye nivîsîn. Tenê "çîrok" hatîye nivîsîn. Li ûna wê min navê " ewê " li çîrokê kir.

Nivîsakarê çîrokê Fûad Temo an jî Fûadê Temo ronakbîrekî kurd e ku ji bajarê Wanê ye û kurê mebusê Wanê Tewfîq Begê Wanî ye. Li Îstebolê digel ronakbîrên kurdan ew jî yek ji aktîftîrîn kesan e ku be darî kar û barên sîyasî û kulturî ya kurdan dibe. Di komele û kovarên kurdan de dixebite. Di 1912'an de ligel Qedrî Cemîl Pa a, Cerrahzade Zekî Beg û hin ronakbîrên din, li Îstebolê yekemîn komela xwendekarên Kurdan; Civata Telebeyên Kurdan-Hêvî'yê datfîn.

Wekî tê zanîn di edebîyata modern a kurdî de, yekem car çîroka modern a kurdî di 1925'an de di rojnama Jîyanewe de derket. Navê vê çîrokê "Le Xewima" ye, nivîskarê wê jî Cemîl Saîb e. Yanê me heta nuha destpêka çîroka modern a kurdî 1925 zanîbû. Lê pi tî ku ev çîroka Fûad Temo derket ronahîyê, êdî yekem çîroka modern a kurdî û tarîxa destpêka wê dikare were munaqe e kirin. Û pîrsek weha derdikeve pê me; gelo di edebîyata kurdî de, em ê destpêka yekem çîroka modern a kurdî wek tarîx 1925 û Cemîl Saîb qebûl bikin an 1913 û Fûad Temo qebûl bikin?

KOVARA ROJÎ KURD Îstanbul, 1913



Kovara Rojî Kurd li Îstebolê bi kurdî (kurmançî-soranî) û tirkî derket. Xwedî îmtîyaz û mudîrê wê yê mesûl: 'Evdilkerîmê Silêmanîyê ye. Di bin navê kovarê de bi tirkî weha hatîye nivîsîn: " îmdîlik ayda bîr ne r olunur" (Nuka mehê carekê derdikeve.) Li ser qapaxa hejmarê pê îna a kovarê rismê Seleheddînê Eyyubî, li ser hejmar 2. rismê Kerîmxanê Zend, li ser ya 3. rismê Huseyin Ken'an Pa ayê Bedîrxanî(1857-1913, kurê Mîr Bedîrxan e, li girava Girîdê jî dayik bûye) û li ser ya 4. jî rismê bajarê Erzerûmê heye.

Her sê hejmarên pê îna kovara Rojî Kurd, ji alî Cemal Xeznedar, di 1981an de li Bexdadê jî nû ve wek cild hat çapkirin. Pi tre di 2005an de Ebdulla Zengene, li Silêmanîyê her çar hejmar bi hev re çap kirin

Her hejmarek wê 32 rûpel e. Ebada wê (li gor çapa nû):24,2x17 cm ye.

Rojî Kurd, organa Civata Telebeyên Kurdan Hêvî (Kurd Talebe-î Hêvî Cemiyetî) bû. Ev cemîyet jî di 1912'an de li Îstebolê hatîye damezrandin.

We andîna kovara Rojî Kurd di 1913'an de hate sekinandin, lê li ûna wê kovara Hetawî Kurd dest bi we anê kir.

Tarîxa derketina her çar hejmaran weha ye:

1.....6 Hezîran 1329/14 Receb 1331/1913

2.....6 Temmuz 1329/14 aban 1331/1913

3.....1 Agustos 1329/11 Remezan 1331/1913

4.....30 Agustos 1329/1913

Bo zêdetir agahdarî binêre:

-Malmîsanîyê û Mahmûd Lewendî; Li Kurdistana Bakur û Li Tirkîyê Rojnâmegeşîya Kurdî (1908-1981),cild-1, We anên Jîna Nû, Uppsala, 1989, r: 53-57

-Ebdulla Zengene, Rojî Kurd, (1913 Estemûl)Govarî Civatî" Hêvî'y Qutabyanî Kurd, Binkey Jîn, Silêmanî 2005 (Mahmud Lewendî).

Roja malwêran



Êro Dalînî

Çi rojke malwêran,
çûkên min ji xulma iya
mestbûneke herijî
iyar dike
ew ê nizanîbû ku ez
di himbêza evîniya xwe de
kêferata man û nemanê dikim?!
ev
roj
bi tîrêjên xwe
yên ku di pencereya
piçûk de kara mexela xwe dikin
min di lerizîne
çavên min
li mirarê çîrokeke bi saw
bel dike
bi qasî jiyaneke
ji mêtina ken
min kûr di bezîne
dibim qepalekî germixî;
û kopalê kalo
min davêje qiraxa rê,
dibêje:
here
ev dever pak û zelale
ûna destava firi teyane,

di kêlîka ku tê de me
mijûl dibim
gêj dibim
bi poçan bi lepên xwe yên
germ dikevim,
ne ezim;
ne ezim yê ku ji evîna
xemrevînê
dûr diçe
ne ezim yê ku ji himbêza
dilovaniya germê
dipûnîje qe ayê
ezim
ezim qe engê dilê hejar
pîneyê xemên harim
û dilsojiya evîniya evên
lalim
lê
lê ev roj xwîsiya min
bi tîna xwe
zuha dike
kelegermiya min bi dijwarî
ji mêranî dixê
neçarî
min bi nivîna xwe
û di dergû a hi mendiya xwe de
bi biryareke tal pûç dike
xatîrekî tisî ji mêya xwe
dixwazim
û bi pêgavên sist
xwe
vedgerînim malê.

Ji (Parastgeha ji kefê, ya te ye)
sherodalini muzik@hotmail.com

Tê bîra min



epal Hêvo

Û tê bîra min
di navbera min û çavên min de
dilopek girî xwe bi benê mêraniyê ve girêda bû
bi tirs bû
nediwêrî ku bi destên evê bigre
û hema carekê bi tenê
di go eya kolanê de
maçekê ji çavên evîndarekî bistîne.

Di pêşîra rojên teng de
li bala te dida
ku li pi ta kesereke boz siwar bibî
û cirîdeyê bi girî re bikî û rê jî bi xwe re bibî.

Li ser tiliyan hêdî hêdî
û mîna dizekî areza
tu nêzîkî çavên xwe dibûyî
geh bi zixuran te li pencereyê dida
qena bajar iyar nebe
û geh jî ji tîrsa ku dîwar giliyê te bikin
te rê îr dida.

Roj bi roj
di xavika bendewariyê de
te kulên xwe av didan
û carna ji neçarî
te çavek bi tiliyên xwe çêdikir
û li wir tu dinviyayî.

EZ Û DOTMAM



Dil ad Mella

Min dî keçek li govendê
Rû bi ewqe wekî findê
Nazîke bejna lewendê
Min dipirsî ma ev kî ye?

Hûrik nerî û kenê xwe da
Min bi çavan silav veda
Mîrim ketim bextê xweda
Dema hejand porê siyah

Xwe berda nav xwîna min de
Wî zû li deryê dilê min da
Sed merheb hey gula rinde
Dil jî ter xwe war û cî ye

Perî û horî delalê
Bîrhên te rengê hilalê
Were em herne sema lê
Me ji gotinên xelkê çî ye

Disa ketim mitala wê
Min dipirsî li rew a wê
Li êl û gund û bavê wê
Dilovanê ma tu ji kû ye

Go 'z nêzîkim ne dût ji te
Were çavan kilkim bit e
Tu min nasnakî sed heyf li te
Go rebeno
Ez dotmama te me!?

Tê xwe bi çî paye bikî...?



Dildar A tî

Tê xwe bi çî paye bikî...?
Bi çî hêrzê
pê waziya pêla agir bikî
û çirava kolanan
li ber deriyê te dipengive
meydana temenê te bê gul maye
te ne gulek
li ser sînga dilberekê çandiyê
ne helbestek
li ser dêma gulekê te hêli tiye
te dîroka evînê
li ber derîkê Memo rawestandiyê...!!
te çî ronak

di ê a bajarê xwe de hildaye
te serê çend fermanarî
di gewlaza dadiyê de badaye
li ser masa têkçûnê
te çend ore
di fîncana qehwê de li darxistin...?
çend peyalên serkeftinê
di nav destên xiloxavî de di ikestin
te karî bû
tevna ramana repînî vepûnî
te karî bû bêtir xewnan bihûnî
te karî bû
ling li qûça sînor bidî

Û keçikên ewran



Ciwan Nebî

Û keçikên ewran xwe di himbêza te de tazî dikin,
tiliyên xwe dirêj dikin riwê te, mûyên sînga te,
keçikên ewran derbas dibin te tevî.
Wilo bi barîna baranê re hest dibî, li çola gotinên qure û
beredayî,
hest dibî ku bajar piçûk dibe, têra gavên te nake,
hest dibî ku bajar koçber dibe
û tu bitenê dengê gavên wî dibihizî_ wilo ji helbestê re dibejî
û bajar di bin baranê de kolan bi kolan xwe ji ûna gavên te
di o,
tu jî kolan bi kolan dilê xwe, tu diçî gavên xwe!!
Tu bi kû de diçî?!!

Baraneke zîv deriyê helbesteke lixwe ikandî digre,
li ber wê dimînin rêyên ku tu wan bi evîna baranê dipîvî
darên li ser qeraxan jî dimînin, mirovên ku ji baranê direvin,
û sawa wan jî, wilo ye.
Mirovekî bi baranê pêçayî
wê çawa karî be silav bike wateyê?!!

Baran di helbestê de naziktir dibare, te ev negot ha!!
te negot ku helbest baranê moxil dike.
Bitenê te çavên xwe girtin qena riwê te sor ahiyek
bibe ferhenga baranê_ tu çî ji baranê hez dikî yaw!!
Çî nazik dibî weke keçikê...

Baran bajar li neyinikan digerîne,
têr naxwin tiliyên te yên sorbûyî ji hezkirinê,
bêrikên te yên tijebûyî bi stranên baranê te nagihînin gavên te,
tu ji xwe bi leztir ti tan derbas dikî, tu hez dikî,
lewra wilo bi baranê re dipeyivî û ew gotin bi gotin dibare,
gotin bi gotin baran hi ê te dibarîne û tu tev dikevî bin baranê
de
tu tev dibî baran û dibarî bi ser bajar de.
Tu digihêjî, tu gihi tî ne?!!
Tu ji xwe dikevî weke bajar ji helbestê!!
weke baranê ji baranê!!
û keçikên ewran di xwîna te de diherikin,
keçikên ewran li dereke din demeke din bi baranê li kolanên
hi ê te digerînin...

Ez ku time vê qîzikê



Bavê Rodî

Ez ku time vê qîzikê
por mê kirî hine kirî
memik bilind hildan banî
çav re kirin û fireh kirin
birhê xwe rast ki andine
lêv sor dikî û mezin dikî
noq ziravkir wek xekekê
roj û heyvê xwe dan alî
gul û kulîlk li ber tewyan
ey xweda ma azê çikim
jêra bi çînim buxçê gula
pir hêjaye û pir delale

bi cilkê tenik û kinikê
libek qurmiz lê werkirî
serê memka dixwiyani
bi ta çava reng reng kirin
mijgûl li wan tewandine
rû sipî dikî bi dermanî
toçek zere li qirikê
sitêrk hatin li dor danîn
dara siyek li ser danî
vê qîzikê bi çî qayl bikim
di navde qesrekê avakim
di dilê mida xwe vedaye

19/6/2012

Azad Remedan

Pênûsa min îro



Serhan Îsa

Pêjna azadiya welatekî dikim

„Her dem bi demê re
û her dem dimîne ji Xwedê re“
Pênûsa min,
eger em bi xwe re bin???
îro dem û Xwedê jî bi me re ne,
em ê vê carê ciyografiya û dîrokê
ne wek bêbextiya wan ya caran,
û ji ber ku,
em fêrî çikandina xenceran di xavikan de
nebûne,
em ê ne wek keyslêhatin û bejin û bala
xwe,
lê belê wek ku heye, binivîsîn.
Ji ber ku
em ji biratiyê û pêkrejiyanê hez dikin
em ê vê carê kesekî li dervayî sînorê
ciyografiya, dîrok û xwederbirîne nehêlin.
Ji ber ku em welathez in,
û ji tenahiyê hez nakin,
em ê dest nedin gewdê vî welatî,
lê em ê bost bi bost hevpar bin.
Ji ber ku em a tîxwazin
di surî t û mentalîteya xwe de
hêmin û ferehsîng in,
milên me, “çarika Pîra Fat in”
fêrî hilgirtina tivingê nebûne.
em ê hevparên xwe jî,
fêrî sirûda “a tiyane heta serxwebûnê”
bikin.

Pênûsa min,
em wek du giyaneweran,
tu bi diwîta xwe,
û ez bi giyanê xwe,
em ê bi derdora xwe ve hilki in,
tu,
ku tu ketî nav tiliyên min,
yên ku ji rojê hez dikin,
suhbet û tewlaziyan, xwe bike
wek dilê xwe,
rahêje destmalka xwe û têkeve serê dîlanê
ji xwe serçopî nînin ji te û pê ve,
û ez ê jî li ser kul û derdên xwe
binivîsînim,
lê biner tu xwe bi dev kesekî ve bernedî,
min mi emir nehêlî û min emirqerisfandî
nekî,
û li pêxê dîlanê,
xwe bi dev xortê xelkê ve bernedî?
Pênûsa min,
em bi hev saxin ne wisa?
Her meh,

heta ku ez te vexwendî dîlana nav
tilîkan bikim,
ez ê parçeyekî ji go tê xwe yê herî
nazik
di devê te yê zirav de deynim.
û soz be,
her gav û kêlik,
ku zikê te yê zirav û dirêj vala bû,
xwe serbijêrî kendûkozên bejna min
ya sitûr bike,
lê bi olife wek ku tu dixwaze,
lê get ipiya nemîne,
devê xwe yê tûj mîna Şûr,
zirav weke Mû veke,
û heme bime e,
û resahiya xwe,
bi ser zikê sipîkaxezan de birijîne,
û bi her çîndirgêkê çirayekê pêxîne.
Pênûsa min,
ez ne Mîr im,
û tu jî ne cêrî û xulam î,
em dost û heval in,
ji ber ku cêrî û xulam
di ber û paxilên germ û hêmin de
nanivin.
Pênûsa min,
ez ê te fêrî kurdbûnê bikim,
tu jî min fêrî sirûda hezkirina xwe
bike,
xamê mizgîn li te xamê
va tu bilind bû giha qamê
bê te windabûm ez li cîhan
weke jarekî li derê han.
Pênûsa min,

Ez ê te fêrî xwarina go tê xwe bikim,
tu jî le ker û mirîdan li dor me kom
bike,
ji xwe li ser rûkê vê gerdûnê,
tu padî aha herî bi saû û sirî,
û ademîzad hemî ji te re le ker û mirîd
in,
û ez pênûsa min,
ez tobedarê bejna te ya zirav û dirêj
im.
Û her ku tu ji qerem ketî,
ez ê te di himbêza xwe ya hêmin û
sincirî de
hêdî hêdî bilûrîn im pênûsa min.
21.06.2012

RÛPELA DAWIYÊ



DIKO

Gola Wanê



Gola Wanê



Gola wanê ji asman

Behra Wanê yan Gola Wanê yan jî Deryaçeya Wanê, gola herî mezin ya Kurdistanê ye (3.713 km²).

Ev gola ku navê xwe jî dide bajarê Wanê gola sodayî ya herî mezin a Tîrkiye û cîhanê ye. Di nava golê de 4 girav hene. Navê van giravan: Girava Extirmanê, Girava Adirê, Girava Çarpanaxê û Girava Çûkan e. Gola Wanê di demên dîrokê de bi navên wek Behra Bilind, Behra Nari, Behra Jorîn û Deryaçe (Derya Biçûk) hildigire. Ava golê pir or û sodayî ye. Bê sebûn kef dide û bêyî madeyên paqijiyê ji her ti t di nav de tê û tin û paqijkirin. Tê gotin ku ava or û sodayî ya gola Wanê ji bo nexwe iyên çermî ba e. Gol her demsal û her saet, rojhilat û rojavayê de rengêkî cuda digire. Qeraxên wê hê in in û plajên xwezayî li derdora golê hene.

Li behra Wanê tema ekirina rojavayê ti tekî jênager e. Bi van hemû taybetmediyên xwe Gola Wanê hêjayî dîtîneye.

Ji Wîkîpediya

Ji stranên
Mihemed êxo

Rew a civat û cihêla
Gerdena van bejin kêla
Xudena sê pel û pêla
Van sê pela civat kêla

Rûni te xwar rûs û çîplaq
îrê spiye gûzik û paq
Ron û ge bûn dîwar û taq
Fermiskê berfîne pê û laq

Rêk û pêk û mi t û tijî
Berdan ava birc û bijî
Xwe lê zîvrand û gîrnijî
Got ez im dîlbera mijî

Bibîne silava gulya
Hawar bû req-reqa tilya
Civat bi carkê hel hilya
Kes nema go ne azerya

Çihêla destêt xwe hildan
Kura li keça çav wer badan
Bû seyran û çeple lêdan
Hemî rexa bû maç lêdan

Bi litrek benzîn 727.5km
dime e

Di meha gulana borî de, îrketa Shel mehrecana 28an a maratona keskayî li bajarê Rotterdam ê Hollendî bi amadebûna 200 tîman ji 24 welatan, ji wan 17 ji Hollenda, li dar xist.

Yekemîn car ev mehrecan di sala 1985an de li dar ket. Îsal tîma kesk a zankoya Twente ya li bajarê Enschede yê Hollendî xelata yekemîn stand.

Turumbêla ku xwendevanên zankoyê afirandibûn 727.5km bi litrek benzîn me iya û xelata yekemîn stand.

Pênûsa nû



Sernivîser
Qado êrîn
Rêvebirê Nivîsînê
Ar ek Paravî
Desteya birêvebir
Pîr Rustem
Silêman Azer
Ezîz Xemcivîn
Abdîlbaqî Huseynî
Lawîn êxo
Derhener
Alan dêrêkî

Ji bo hinartina berhemên kurdî:
kurdi.penusanu@gmail.com